AMADEYÎ

# DARIŞTIN

# 4

**Ev pirtûk, ji aliyê Komîteya Perwerdê ya KCK'ê ve weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

## AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

*M. Şîrîn ÇETİN*
*Merwan YAMAN*
*Mazlum TEKIN*

## Mîzanpaj

*Bedredîn OY*

*Çapa Yekem: 2015 / Mexmûr*



## *EY REQÎB*

*Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman*
*Naşikê  û danayê topê zeman*
*Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin*
*Jîn dibi qet nakevi ala Kurda*


*Ême xortên rengê sor û şoreşin*
*Seyr bikin xwîna wî ya rabirdûman*
*Kes nebên Kurd dimirin Kurd jîn dibin*
*Jîn dibin qet nakevi ala Kurda*

*Ême xortên Mediya û Keyxusrewin*
*Dîn îman û ayîman her niştîman Kurd û kurdistan*
*Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin*
*Jîn dibi qet nakevi ala Kurda*

*Lawê Kurd rabûye ser pê wek şêran*
*Ta bixwîn nexşîn bikin taca jiyan*
*Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin*
*Jîn dibi qet nakevi ala Kurda*

*Xortê nû tev hazir û amedene*
*Canfîdane canfîda her canfîda*
*Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin*
*Jîn dibi qet nakevi ala Kurda*

***Yûnûs RAÛF (DILDAR)-1946***



“**Bêguman emê wêjeya demê Neolotîkê pêkbînîn.”**

*Rêber APO*

## NAVEROK

**BEŞA I** ........................................ **13**

PÊNASE, CÛR Û PÊKANÎNA DARIŞTINEK SERKEFTÎ ........................................ 13
DARIŞTIN ÇI YE? ........................................ 13
PLANA PÊKANÎNA DARIŞTINA NIVÎSKÎ ........................................ 16
AWAYÊ NIVÎSÎNA DARIŞTINÊ ........................................ 18
ENDAMÊN DARIŞTINEK SERKEFTÎ ........................................ 20
1- MIJAR ........................................ 20
TAYBETMENDIYÊN MIJAREK SERKEFTÎ ........................................ 21
2- ARMANC ........................................ 22
3- PLAN Û SÛDÊN PLANÊ ........................................ 24
DI DARIŞTINÊ DE PÊKANÎNA PARAGRAFAN ........................................ 26
CÛRÊN DARIŞTINÊ ........................................ 29
A- DARIŞTINA NIVÎSKÎ ........................................ 29
1- HÛNANDÎ ........................................ 30
2- PEXŞAN ........................................ 33
B- DARIŞTINA DEVOKÎ ........................................ 34

**BEŞA II** ........................................ **39**

CÛRÊN DARIŞTINÊN NIVÎSKÎ YÊN PEXŞAN ........................................ 39
NIVÎSÎNA SERPÊHATIYÊN KURT ........................................ 40
C- NIVÎSÎNA SERPÊHATIYEK KURT YA JI XWE RE HÊLAYÎ ........................................ 42
SAZKIRINA KURTENIVÎSÊN RAMANÎ ........................................ 43
NIVÎSÎNÊN RAMANÎ ........................................ 43
GOTAR ........................................ 46
TAQÎKIRIN ........................................ 50
NAME ........................................ 53
CÛRÊN NAMEYAN ........................................ 54
DAXWAZNAME ........................................ 62
TELGIRAF ........................................ 64
VEXWENDNAME ........................................ 66
RAPOR ........................................ 67
ŞANO ........................................ 70
BEŞÊN ŞANOYÊ ........................................ 71
CÛRÊN DARIŞTINÊN NIVÎSKÎ YÊN HÛNANDÎ ........................................ 80

**BEŞA III** ........................................ **80**

DESTAN ........................................ 80
STIRAN ........................................ 83
ROSTEMÊ ZAL ........................................ 87





## PÊNASE, CÛR Û PÊKANÎNA DARIŞTINEK SERKEFTÎ

### XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Li gorî we, ji bo nivîsînek bala we bikişîne divê çawa be?
2- Ji bo darîştinek birêk û pêk bê nivîsandin, divê em balê bikişînin li ser çi?
3- Birêkûpêk karanîna kaxezê, çi sûdê dide darîştina serkeftî?

### DARIŞTIN ÇI YE?



Darîştin, peyveke koka wê ji zimanê Firansî hatiye. Bi zimanê Firansî bawayê "Compisision-Kompozisyon" tê nivîsin.

Em ji komkirina parçeyên cuda cuda, bi awayekî rêkûpêk û bipîvan anîna rewşa tevayekê re dibêjin darîştin. Ji bo me mirovan, têgihandina hest, hizir, xem û dîtinên xwe bi yê beramberî xwe re; qala xwe kirin, pirsgirêkên civakî anîna ziman, pêwîstiyeke. Em bi derdorê xwe re têkiliyan datînî, gûhdarî pirsgirêkê wan dikîn, yan jî pirsgirêkên xwe ji wan re vedibêjîn. Ji vê têkiliyê, danustandina hizirinê çêdibe. Bi awayekî serkeftî ragihandina hizir û hestên xwe ji kesê beranberî xwe re, kareke ku herkes dikare bike ye.

Axaftin û nivîsandin dû tiştên ji hevdû cudane. Dema ku em daxivîn dibe ku raveyên me kurt û cewher, yan jî dirêj bin. Di axaftinê de dibe ku hevokên bi destûr yan şkestî jî bên bikaranîn. Lê ji bo karê nivîsînê disiplîn û sazûmanî pêwîste. Her wiha pêwîste bal bê kişandina li ser xalekê: Darîştin, ne şêwe yan cûrek yê nivisînê ye. Tevayek ya zagonane ku di hemû cûrên nivîsînan de pêwîste bê berçav girtin. Bi kurtî darîştin hem pexşan û hem ji hûnandî ye. Di be ku serpêhatî be, dibe ku roman be. Lewra dema em bixwazin binivîsîna mijarekê hest, hizir yan dîtinên xwe bînîn ziman, nabe ku em bêjin me darîştinek nivîsiye. Ji

ber, dibe ku ew mijar gotar, serpêhatî, çêrok yan geryanameyek be. Bi kurtî em dikarin bêjin, dariştin ne cûrekê yê nivîsinê ye.

Emê di vê mijara xwe de tenê mijara têgihandina nivîskî bigirin dest. Lê divê neyê jibîrkirin di çengên zanistê yên weke; mûzîk, mîmarî, wêne, pêkertiraşî heta wergirtina cil û bergan de zagonên dariştinê hene.

**Dema dariştin tên nivîsîn, xalên ku berçav bên girtin evin:**

**1- Bixwînin**




Rêya nivîsandina dariştinek serkeftî, di zêdexwendinê re derbaz dibe. Xwendin, dewlemendiya hizrî, gencineya peyvan û kêrhatina têgihandinê ji bo kesan dide qezençkirin. Cîhana xeyalî ya mirov, bi peyvên dizane re tixûbdare. Gencineya peyvan ya kesan çiqas berfireh be, cîhana wî ya xiyalî jî ewqas firehe.

**2- Destûrên ziman fêr bibin**



Rêgezên xweser yên zimanê nivîskî hene. Weke daxivîn, nikarin binivîsîn. Dema dinivîsîn, em nikarîn destûrên rêziman binpê bikîn. Ger em li ser ziraviyên wateya peyvan ne baldarbîn, emê bikevin şaşiyan. Herwiha dema em di nivîsîn, divê em wateya peyvê ya rast û xazeyê baş bizanîn û li ser biwêj û gotinên pêşiyan yên di zimanê me de heyî desthilatbin.

**3- Peyvên ne pêwîst, bikar neyînin**



Pirisgirêkek girîng ya ku bi xala derbazbûyî re jî têkildare, bikaranîna peyvên nepêwîstin. Karanîna peyvên nepêwîst, kêmaniyek ya têgihandinê ye. Ji ber wê, dema dinivîsîn divê ji karanîna peyvên nepêwîst birevîn. Heta pêkan be divê hevokên kurt saz bikîn. Divê hevokên xwe zêde bi peywendan dirêj nekin. Ji ber ku di hevokên dirêj de, komkirina hizirîna tê xwestin zehmet dibe.

**4- Di heman mijarê de peyvên hevwate dûbare bikar neyînin**




Di nava heman mijarê de peyvên hevwate yên weke; "ber-kevir, mijar-babet, mêjû-dîrok, sotin-şewitîn" bikar neyînin. Lêbelê hûn dikarin peyvên ku di bingeh de nêzî hevin, lê bi demê re bi wateyên cuda hatine bikaranîn yên weke; "rûspî-serbilind, rastbêj-durist, rûken-keyfxweş" di mijara xwe de bicih bikin.

### 5- Ji berê hûn binivîsin, bihizirin



Hizirîn, xebateke ku tê wateya dirêj dirêj lêkolînkirinê û nirxandina encamê vê lêkolînê. Taybetmendiyeke ku xweser girêdayî mirovane. Ji bo em baş bixwînin û binivîsin, pêwîste bihizirin. Berê ku em dest bi nivîsandinê bikin, divê li ser mijarê bihizirin.


### 6- Bikaranîna kaxezê



Ger em darişitina xwe li ser kompûterê binivîsin, pêwîste ji beriya ku di pirintirê re derbêxin, li ser sazûmaniya rûpel pîvana tê xwestin bidin nivîsinînê. Ger em bi dest binivîsin, pêwîste em çarçoveya nivîsînê li ser kaxezê diyar bikin û bi awayek rêk û pêk di nava çarçova diyarkirî de nivîsîna xwe bicih bikin.

### LÊKOLÎN

1- Gelo dîrokek ya derketina dariştinê heye? Lêkolîn bikin.
2- Di nivîsîna dariştinê de xalên li ber çav tên girtin kîjanin?
3- Hûn jî li gor têgihiştina xwe nivîsînek wêjeyî bi awayê dariştinî binivîsin.



## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Ger em mijara nivîsînek wêjeyî diyarnekin, wê çi bibe?
2- Çima pêwîste em mijara nivîsîna xwe bitixûb bikin?

## PLANA PÊKANÎNA DARIŞTINA NIVÎSKÎ



### 1- Diyarkirina mijarê

Her tişta ku axaftin li ser tê kirin û nivîs li ser tê nivîsîn, mijare. Ji ber vê yekê divê mijara ku bê vekirin, bi awayek zelal bê diyar kirin.

### 2- Bi tixûbkirina mijarê

Di dariştinan de bitixûbkirina mijarê gava herî girînge. Mînak; ger em li ser mijara "**perwerde**" bixwazin dariştinek binivîsin, ji ber ku qada mijara perwerdê pir berfirehe, em nikarin her alî bigrin dest û neçarîn tixûbek daynin pêşî. Emê li gorî dîtina xwe mijarê vekin û sazûman bikin. Ji ber ku bi awayên cûda cûda mijara perwerdê dikare bê vekirin.

Dema mijara bê vekirin hat diyarkirin, pêwîste li ser vekirina beşên destpêk, naverok û encamê bê fikîrîn. Dema ev pilan tê çêkirin, divê dûrketina ji mijarê çênebe.

### 3- Sergotar

Sergotar, nasnameya nivîsînê ye. Sergotar, pêwîste ramana bingehîn ya mijarê di nava xwe de bigre. Divê bi soje û mijarê ve hevseng be. Divê ne pir dirêj be û ji çend pevan pêkhati be.

### 4- Destpêk

Ev beş, bi armanca nasandina mijarê bi xwendevan û berdayîna xwendevan ber bi mijarê ve tê destgirtin. Ji ber vê yekê pêwîste paragrafa destpêkê bi bandor be.

### 5- Naverok

Ev paragraf, mijarê vedike û berfireh dike. Dikare ji çend paragrafan pêkbê. Di paragrafên naverokê de, dikare girêdayî mijarê mînak, pendên pêşiyan, gotinên mezinan, yan jî biwêj bên bikaranîn.

### 6- Encam

Ev beş, hizirinên di beşên din de komî serhev dike û bi çend hevokan rave dike. Bi vî awayî dawî li mijarê tê anîn.

### LÊKOLÎN

1- Çi ciyewazî di navbera destpêk û encama mijarê de heye?
2- Di dariştinekê de paragrafa herî mezin kîjane û di wê paragrafê de mirov dikare kîjan xalan bikar bîne?



## XEBATÊN AMADEKARÎ


1- Ger kelûpelên pêwîst nebin, em dikarin dariştinekê binivîsin?
2- Dema em asta xwendevanên xwe li ber çav negirin, wê çi bibe?

## AWAYÊ NIVÎSNA DARIŞTINÊ

**Dema em dariştinekê dinvîsin, dû xalên ku em li ber çavan bigirin evin:**

**1-Di aliyê awêneyê de**

- Pêwîste kaxeza ku em dariştinê li ser dinivîsin, li rexên wê valehiyên pêwîst bihêlin.
- Pêwîste em navê xwe, navê refa xwe, jimara xwe û dîroka rojê li cihê pêwîst bicih bikin.
- Divê kelûpelên pêwîst amade bikin.
- Pêwîste em armanca xwe û ramana xwe ya bingehîn baş diyar bikîn.
- Pêwîste em asta çand û perwerdeya xwendevanên xwe li ber çav bigirîn.
- Divê em nivîsîna xwe xweşik û sererast binivîsin.
- Divê sererêza paragrafê hinekî ji mal (1-2 cm) de destpê bikin.
- Divê em navberên rêzên xwe ne zêde fireh ne jî teng bikin.





**2- Di aliyê naverokê de**

- Divê em li ser têgehên bingehîn yên mijara dariştinê saz dikin, rawestin.
- Divê em hizirînên xwe li gor rêza eleqederî û girîngiyê rêzbikin.
- Divê em sergotarek guncaw ji bo mijara xwe danin. Nivîsîna bê sergotar nabe. Pêwîste sergotar kurt û balkêş be.
- Divê hizra me dayî pêş, lêdanê baş li ser bikîn.
- Divê em ji rêyên pêşxistina hizirinê (mînandin, beranberkirin, nîşandayîna bîner) sûd bigirin.
- Divê hevokên xwe kurt binivîsin û hevokên darezandinek tenê rave dikin, sazbikîn. Bi vî awayî em dikarîn uslûbek herikbar pêşbixin.
- Ger di nivisînê de beşên ne di cih de yan dûbare hebin, jê bavêjin.
- Divê hewil bidîn ku peyvên di serê xwendevanan de zindîkirinê çêbike, bikar bînin.
- Divê em hêmadaninê rast û di cihê wê de bikarbînin.



**LÊKOLÎN**

1- Li gor xalên hatîn rêzkirin, dariştinekê binivîsin.

2- Çima pêwîste em hêmayan di cih de bikar bînin? Ger di cih de bikar neynin wê çi bibe?

3- Mijarekê destpêkê bê hêma binivîsîne û bixwîne, pişt re hêmayên pêwîst bicih bike û bixwîne.

## ENDAMÊN DARIŞTINEK SERKEFTÎ



1- Mijar
2- Armanc
3- Plan û Sûdên Planê

### XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Ma mirovek dikare tiştekê jiyankirî, ji xwe re bike mijar?
2- Dema mijara me nebalkêş be, em dikarin li ser wê dariştinekê balkêş binivîsin?

## 1- Mijar

Her tişta ku em li ser dihizirîn, pêdiviyê pê dibînin ku nivîsînê li ser binivîsin yan jî axaftînê li ser bikin, mijare.

Ev jî dibe ku buyer, heyîn, raman, çavdêrî yan jî pirsgirêkek jî be. Mijar li gorî awayê kêrhatina xwe, bi hinek beşan tê dabeş kirin.

### Mijarên Civakî

Mijarên civakî, mijarên ku tevahiya civakê yan jî beşekê civakê têkildar dikine. Mijarên weke; jiyana gund, bajar, navçe, pêkanîna malên hevpar yên civakê, têkiliya mirovan ya bi xwezayê re, çanda civakê, toreyên civakê, pîrozbahiyên civakê û rewaniya civakê digre nava xwe.

### Mijarên Kesî

Mijarên kesî; mijarê ku yekser xwe palve dide taybetmendiyên kesîne. Mijarên weke; pêkhatina rêkûpêkiya kesî û belavbûna kesî digre nava xwe.

Mijar, dibe ku bi awayê şênber û razber yan jî xwecihî û giştî bên cuda kirin. Nivîsandinek di rewşa mijarek hizirî de razbere. Mijarên weke; heskirin, aşitî û mirin mijarên razberin

û di heman demê mijarên kêrhatina giştî hildigirin. Di wargeha me de, pirsgirêkên gelaş; mijarek xwecihiye yan jî xwesere.

Jiyan, bîranîn, hêvî, xewn û xiyal, heskirin û çavdêriyên me yan jî tiştê ku me xwendî, her yek ji van, ji bo me bingehê mijarekêne.

### Bijartina Mijarê

Di xebatên xwendin û nivîsandinê de, mijara darîştinê piranî mamoste diyar dikin. Mînak; "xwendin ronahiya jiyanê ye." vê gotinê vekin. "Şoreşa Rojava şoreşa jinê ye." Li ser vê gotinê darîştinekê binivîsin.

"Reftarên kesekê we gelek hawêj kirî" bidin naskirin.

## Taybetmendiyên Mijarek Serkeftî

- Mijar, divê balkêş be: Ger mijarek bala me nekişandî be, divê em afrêner bîn.
- Mijar, divê vekirî, têgihayî û bibawer be: Mijarek ya ne bibawer, li ser wê mijarê nivîsandinek serkeftî nayê nivîsîn.
- Mijar, divê hevsengê cûrê ravekirina nivîskî û devokî be.
- Mijar, divê ji bo armancekê be.
- Mijar, divê hînker û fêrker be.
- Mijar, divê ne berûvajî nirxên civakî be.
- Mijar, divê hevsengê dewlemendkirina hest, raman û xiyalan be.
- Mijar, divê gotin hevsengê tiştên resen be.
- Xwendekarên me kîne, ji kê pêktên, divê em bizanin.
- Şîrovekirin û teknîka şîrovekirinê divê em diyar bikin.

### LÊKOLÎN

1- Çima pêwîste mijara me hînker û fêrker be?
2- Taybetmendiyên babeta dibe mijara darîştinê çine?
3- Ciyewaziyên di navbera mijarên civakî û kesî de çine? Vekin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Hûn dizanin ramana bingehîn li kû derê tê bikaranîn?
2- Ma Mijarek bê armanc sûdê wê heye?

## 2- Armanc



Her nivîsîn, armancek ya xwe heye. Armanc, ya me ber bi nivîsînê ve dehf dide û hizra bingehîn ku tê xwestin em bidine. Mijar amêrek ya ragihandina van ramanane.

### Hevoka Armancê Diyar Dike (Ramana Bingehîn)



Di nivîsînê de, hevoka armanca me diyar dike jê re ramana bingehîn tê gotin. Ji beriya ku em dest bi nivîsînê bikîn, divê em ramana bingehîn diyar bikîn. Çêbûna ramana nivîsînê li ser ramana bingehîn tê avakirin. Tişta em dixwazin bînin ziman, bi vê ramanê ber didînê. Hevoka ramana bingehîn, di nivîsînê de cihê wê yê diyar nîne. Dibe li serê nivîsê be, dibe di nava nivîsînê de be yan jî dibe ku di tevahiya pêhesandina mijarê de be. Armanc yan hevoka ramana bingehîn, têkildarî lê temaşekirina me ya mijarê ye. Dema dû xwendekar heman mijarê bigirin dest, dibe ku şîroveyên cuda cuda pêşkêş bikin. Dibe ku li ser heman mijarê, ramanên bingehîn yên cuda cuda derbikevin holê.

Ji bo em armancê pêkbînin, divê em çavdêriyê bikîn. Tişta ku em di mijarekê de bibêjîn, girêdayî çavdêrî û jiyankirina me ya li ser wê mijarê ye. Dema em demdirêj temaşeyî tiştekê dikîn, ew temaşekirina demdirêj dihêle ku hîn bêhtir milên cêwaz yê wê tiştê hîn bibîn. Di mijarekê de çavdêrî û jiyankirina me çênebe, em nikarin nivîsînekê serkeftî binivîsîn. Xwendekarekî di temenê xwe de, ger derya nedîtibe nikare li ser bahoza deryayê şîroveyek rast bike.

Ji ber vê çendê pêwîstiya me bi xwendin û lêkolînkirinê heye. Yên destpêkê temaşeyî buyer û pirsgirêkên li ser ruwê erdê kirîn, ne emin. Ji beriya me gelek kesan gelek buyer jiyan kirine û gelek şarezayiyên pîroz bidest xistine. Di derbarê wan de hizrên xwe derbazî nivîsînê kirine. Divê em ji vê çavkaniya çandê sûd bigirîn. Divê em xwendin û lêkolînên

xwe, çavdêrî û ramanên xwe fireh bikîn. Divê tişta em bêjîn bibawer be. Tenê bi temaşekirinê çênabe. Divê em sûdê  ji nivîsinên zanyarên pêşiya xwe bigirin û xwendekaran têbigihinin.



**LÊKOLÎN**

1- Ji ber çi em mijarên wêjeyî bikartînin?

2- Dariştinekê binivîse û armanca wê mijarê diyar bike?

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Hûn dizanin bêplan, nivîsandinek wêjeyî nepêkane?
2- Ger nivîsandinek bêplan bê nivîsandin, pêkane balkêş be?

## 3- Plan û Sûdên Planê



Nivîsînek bê plan dişibe nameyekê bê navnîşan. Tişta ku em bêjîn û çavdêriyên ku em bikin, divê di planek tekûz de bê rêzkirin. Divê çi, li kû derê û çawa bikarbînîn, bizanîn.

Ger hizrên ku em bêjîn, ne êxîn di nava planekê de, em nagihîn tevahîbûna mijara xwe. Girêdana di navbera hizir û gotinê de qut dibe û hevsengî têkdiçe. Di nivîsînê de yekbûn, hevsengî û zindîbûn, mercên serekene. Plan, awênkirin, li gorî têkîliyên di navbera wan de rêzkirin û gotinên me çavdêrî kirine. Divê em planê, di hemû cûrên nivîsandinê de, li ber çavan bigirîn. Ji nivîsîna nameyê heya romanekê, divê plan tê de bê pêkanîn.

Dema em nivîsînek dirêj dinivîsîn, yanî weke roman û serpêhatiyê dibe ku em planê dihzirê xwe de negirîn. Lê plana hatî diyarkirin, ger derbazî kaxezekê bikin, dê sûdê wê hebe.

Plana ku em çêdikin, divê herdem girêdayî wê bin. Di dema nivîsînê de, ger hin guhertinan çêbikîn jî, xwezayî ye. Ev rewş ne berevajî planê ye. Plan ji bo nivîsîna me ne armanceke, amêreke. Em, wê çawa dixwazin wisan bikartînin.

### Girîngiya Planê

- Plan dihêle ku hest û ramanên me, hîn bêhtir û bandortir bên têgihandin.
- Di mijarê de, hevsengî û yêkbûnê pêktîne.
- Di mijarê de, jêgirtina hest û ramanên ne pêwîst pêktîne.
- Kesên ku bi plan nivîsînan dinivîsin, ji bêbiryarbûn û belavbûnê rizgar dibin.

### Beşên Planê

**Li gor planê, dariştin ji sê beşan pêktê;**



### 1- Destpêk



Beşa danasîna mijarê ye. Divê vekirî, xwerû, balkêş û kurt be. Ji bo ku mijara tê xwestin bê vekirin, destpêkê hizra pêwîst tê peydakirin û ev hizir di beşa destpêkê de tê diyarkirin. Beşa destpêkê, yek ji beşa heri biçûk ya dariştinê ye. Di vê beşê de, tenê ramana tê xwestin bê vekirin, diyar dibe. Di vê beşê de mînak nayên dayîn û daxuyanî çênabin. Divê zanînên kurt û cewher bên dayîn.

### 2- Naverok



Beşa naverokê, beşa ku çavdêriyên têkildarî mijarê, vekirin û çespandinên mijarê pêktînin. Guman û xurûş derdikeve asta herî jor. Hizrên ku di beşa destpêkê de hatîne diyarkirin, di vê beşê de bi awayek berfireh tên vekirin. Di vê beşê de ger pêwîstî bi mînak dayînê hebe, mînak tên dayîn. Lê belê wekû dibêje mînak destpênake û peyva “mînak” nayê bikaranîn. Mînakên ku tên dayîn, divê ji yekê zêdetir nebe. Di beşa naverokê de dibe ku ji yekê zêdetir paragrafan bikarbînin. Di vê beşê de armanca nivîskar pêktê.

### 3- Encam



Beşa dawî anîna mijara hatî destgirtine. Buyerên hatîn têgihandin, hizrên hatîn pêşkêşkirin, bi awayek mîsoger û cewher tên encamdan. Beşa encamê divê weke beşa destpêkê balkêşbe. Beşa encamê, dibe ku bi gotinek ya pêşiyan, yan jî bi biwêjekê bi dawî bibe. Di beşa encamê de hizrên hevpar yên destpêk û naverokê yanî ramana bingehîn tê nivîsîn. Her wiha ev beş yek ji parçeya herî kurt ya beşa dariştinê ye.

**Têbinî**

*Dariştin; divê herî kêm ji sê paragrafan pêkbê. Dibe ku beşa naverokê ji yekê zêdetir ji paragrafan pêkbê*

## Di Dariştinê de Pêkanîna Paragrafan

Paragraf; hestekê, ramanekê, darezandinekê, rewşekê û xwestekekê diyar dike.

Ji kombûna hevokan yan jî ji rêzehevokên ku, bi alîkariya ramana alîkar, ramana resen dide têgihandine.

Ya paragrafan ji hev cuda dike, sererêze. Di her paragrafê de hevoka bingehîn heye. Ev hevok di heman demê de, bi hevokên alîkar re di nav têkiliyan de ne. Hevokên paragrafê yên din jî, ji bo vekirina ramanên hevoka bingehîn tên bikaranîn. Paragrafên destpêk, naverok û encam tevahiya mijarekê tînin holê. Ji derveyî van paragrafan, hin paragrafên din jî hene. Ev paragrafên he li gorî awayê karanîna mijarê wiha tên rêzkirin:

### Paragrafa Buyeran

Dema milekî diyar yê buyerekê di nava tevahiya nivîsînê de derbaz bibe, di vê paragrafê de tê têgihandin. Di vê paragrafê de aliyek diyar yê buyerê li gel reftarên mirov yên di derdor de tên têgihandin.

### Paragrafa Wêneyîkirinê

Benda danasîna kes, lawir, tişt û dîmenên têkiliya wan bi buyerê re heyî ye.

**a- Wêneyîkirina Mirov (Portre)**

Danasîna çêbûna mirov ya bedenî, weke; bejin, rû, reng, wergirtin yan danasîna mirov ya rewanî, weke; hest, raman, hoy, zewq û reftarane.

**b- Wêneyîkirina Lawiran**

Danasîna lawirekê diyar ya di buyera hatî têgihandin de ye. Taybetmendiyên wan lawiran diyar tên dayîn û tên nasandin. Weke taybetmendiyên stû, mû, çerm, ling, simik û çêbûna devê wan dide têgihandin.

**c- Wêneyîkirina Tiştan**

Danasîna tişt yan jî tiştên diyar, yên di buyerê de hatîn têgihandin çêdike. Hemû taybetmendiyên tiştan radixe ber çavan.

Nivîskar palvedide çavdêrî û zanînên xwe yên di derbarê wan tiştan de, wateya wan ya ferhengî lêkolîn dike, hîn dibe û bi wêneyîkirinê bala guhdarên xwe dikişîne. Tiştê herkes dizane, yên di jiyana rojane de tên bikaranîn bi awayekê pesinkirî, wêneyîkirina wan tiştan çêdike û tîne rewşek balkêş.

**d- Wêneyîkirina Dîmenan**


Danasîna cihê buyer tê de derbaz buyî, weke; çiya, deşt, zevî, baxçe, daristan, kolan, şeqam, gund û bajaran bi dîmanên balkêş, bi awayê wêneyîkirinê dide têgihandin. Wêneyîkirina van dîmenan, divê weke wêneyekê yan jî pêşdariyekê be.

## LÊKOLÎN

1- Dariştin ji çend beşan pêktê û beşa naverokê dikare ji paragrafekê zêdetir be yan ne? Veke.

2- Di paragrafa despêkê de çi tê têgihandin?

3- Paragrafa herî kurt û balkêş kîjane û çima?



## Mînak:

Sergotar

### XURÛŞA DI ŞEVEK BI KÎN DE

Destpêk

Piştî cejna remazanê bû, ew çend roj bûn çeteyên DAIŞ êrişî derdorê dikirin. Neynewa û Şengal dagir kiribûn. Li hember vê rewşê, rêveberiya başûr di nava dûdiliyê de bû. Ji ber nekeve şer, daxuyaniyên nakok didan. Her çiqas hinek amadekariyên me hebûn jî, li hember hovîtiyek ew qas mezin, bi çekên biçûk û bihêzek nepispor, rawestan nepêkanbû. Bawerî anîna bi hêzekê

Naverok

Belê, roja em jê ditirsiyan hatibû. Gotina mezinan ya dibêje; " Tî ji çi bi tirsî, ewa bê serê te." Carek din piştrast dibû. Navçeya Mexmûr ketibû li ber xirêna mirinê. Êdî demê hizirînê hatibû. Me nûka dest bi kolana binerdiyê kiribû. Binerdiya dibin mêwa pelkeska bi tiriyê reş hatî xemilandin de, dihat kolan. Pêwîstbû wê şevê tekûz bibe, lê bi tariya şevê re dû zilamên cîranên me bilez derbasî hewşê bûn û ji zarokan pirsa min dikirin. Bi dengê wan re ez bi giringiya mijarê hesiyam û bi cem wan ve çûm. Wan ji min re dabaşa pêşketinên dawî kirin.

Li ser daxwaza wan ez û cîranê cilê gabardîn li ber, serê xwe bi kefiyekê pêçayî re çûn navenda rêveberiyê. Di rê de kombûn û şaşbûna ruwê welatiyan, bala mirovan dikêşan. Bilez me deriyê hewşa navendê vekir, ez di pêpilkan re hewa ketim. Hevalê min ji şerma şaşfêmkirina tirsînê, li nîvê hewşê rawestayî û li benda bersiva navendê ye.

Piştî destûr xwestinê, derbazî jor bûm. Li ber derî serokê meclîsê bi rengekê bêgêwil li ser piya rawetayî bû. Ji min xwest ku ez çen xulekî rawestim. Li ser daxwaza wî ez derketim ji der ve. Lê xuleyek derbaznedibû, bersiva ez nelibendê bûm, hat. Bidengekê tejî êş ji min re digot: "Herin ji her kesî re bêjin; bila rabin emê wargehê ji jin û zarokan vale bikin." Bi gotina wî re, xurûşa di dilê min de destpêkir û min ji xwe re got: "Ma çi buye, pêşmerge şûn de çûne yan bi DAIŞ'ê re peyman pêkhatine?" Di nava vê xurûşê de bi hevalê xwe re zivirîm û her kesê di rê de me dîtî, agehdar dikir.

Li nêzikî malê, jinekê rûken û zarok hûr li ber ronahiya fenera destan, nan li tenûrê didan. Bi cîrana xwe re daxive û dikene, nanê sorkirî ji tenûrê derdixe. Nîvê hevîrê wê hê di teştê de ye. Ji nişka ve min got: "Zarokên xwe amade bike, emê wargehê berdin!" Destpêkê nexwest bawer bike, lê piştre ji rengê min bawerkir, bilez dest ji nan berda û bezî hindir. Di heman demê de ez jî derbazî mala xwe bûm. Xwarin hatibû danîn, av li ser sifrê dihat rêzkirin. Bi hatina min re dexwestin destbi xwarina tirşika bamiya bikin.

Encam

Ev roj, roja li hev xwedî derketin û parastina rûmetê ye. Di vê şevê de wê kesên bibiryar, biryara berxwedanê bidin û herêmê biparêzin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Ma tenê nivîsînên pexşan dikare ji darişţinê re bibin bersiv?

2- Mirov dikare hest û ramanên xwe bi awayek wêjeyî, bi awayê hûnandî bine ziman?

## CÛRÊN DARIŞTINÊ

**Darişţin li gorî awayê karanîna xwe dibe dû beş:**

### A- DARIŞTINA NIVÎSKÎ

Nivîsîna darişţinek baş û xweşik, hedar û ziraviyê dixwaze. Mirov başnivîsînê bi zû nivîsînê fêrnabe. Dijberê wê, bi başnivîsînê fêrî zû nivîsînê dibe. Ji bo di têgihandina nivîskî de serkeftî bibîn, pêwîste pîvanên darişţina nivîskî baş bizanîn û wan bi xebatên nivîsandinê re pêşbêxîn. Başnivîsîn, tê wateya baş hizirîn, rast bihîstin, baş têgihandin û di heman demê de buyîna xwedî zewq, giyan û hizirinê ye jî. Ji bo bikaribîn nivîsînek baş û serkeftî binivîsîn, destpêkê pêwîste rast bihizîrin û bibihîsîn, paşê bi aweyek herî baş têbigihîn. Yanî beriya em binivîsin, pêwîste em fêrî hizirinê bibîn.


Xweşiknivîsin hûnereke. Kêrhatinek taybet dixwaze. Weke nivîsîna helbest, serpêhatî, roman û ... Lê belê baş û rastnivîsîn negirêdayî kêrhatinê ye. Her kesê ku xwedî zewq û fêrbûnek ya nivîsandinê be, rêbaza nivîsandin û zagonên rêzimanî baş bizani be, xwedî serbûriyek pêwîst ya sazkirina plan û paragrafan be, bi demê re xwe digihîne serkeftinê. Xweşiknivîsandin ne karek asane. Ji bo vê, divê kes xwe fêr bike, pêşbêxe û sazûman bike.





# Di Nivîsînê de Dû Awayên Raveyê Hene

## 1- Hûnandî



Ji pexşanê cûda, hûnandî bi awayek giştî şêweyê vegotina bi pîvan û qafiyeyê çêbuyî ye. Berhemên ku ji hûnandiyan hatîn afirandin, hûnandî tê binavkirin. Lê her hûnandî nabe helbest.

Helbest; cûrek yê dariştinê ye ku em hest, hizir û xiyalên xwe biriya wê, bi aheng û bi bandor pê tînin zimane.

Ji bo ku em helbestê binivîsin, divê em van taybetmendiyan li ber çav bigrin:

**a-** Kesê helbestê dinivîse, berî her tiştî divê xwedî kombûnek ya şarezayiyê be.

**Ji bo vê;**

**I-** Ji bo helbestê binivîsin, divê pêkhateya giştî ya civaka em tê de jiyan dikin, derbazbuya wê, tore û heyînên wê yên pîroz baş bizanîn. Divê em di nivîsîna helbestê de, ji raveyên ku dijberî van nirxan dikeve birevîn.

**II-** Pêwîste zagonên rêziman, pîvanên nivîsînê û hêmadanînê bikarbînin. Di heman demê de hem di axaftin hem jî di pêkanînê de baş bikarbînin.

**III-** Divê xwedî gencineyek dewlemend ya peyvan be. Divê zanîna zimanê çandî baş bizanibe.

**IV-** Dema em peyvên ku di helbestê de bikarbînin, hilbijêrin; divê em li ser wateya peyvê baldarbîn.

**b-** Kesê helbestê dinivîse, divê xwedî serboriyek baş be. Ji ber vê divê helbestên helbestvanên cuda zêde bixwîne û ceribandinên nivîsîna helbestan zêde pêkbîne. Lê divê neyê jibîrkirin, çiqas bênivîsin ewqas zêde helbestên xweş tên bidestxistin.

**c-** Sê hêmanên girîng yên helbestê hene; hest, hizir û xiyal. Helbestvan dikare yek ji van derbêxe plana pêş.

Di helbestvanên ku hest dertêxe plana pêş de, ramana bîrdoziyê girînge. Mînak; Cegerxwîn, Hozan Serhat, Hozan Mizgîn, Hozan Sefqan û ...Carnan helbestvanek coşa hest û xiyalan bi bihizirînê re dike yek û dertêxe pêş. Weke; Şêrko Bêkes, Ehmedê Xanê û ... Kesê ku helbestan dinivîsin, divê bizane ji van hêmanan wê kîjanê bikarbîne û çawa bigre dest.

**d-** Divê neyê jibîrkirin ku nivîsîna helbestan kêrhatineke. Ji bo bikaribin helbestek bi bandor û xwedî wateyek kûr bihûnin, divê kêrhatinên me yên baş hebin.

**Mînak:**



# PÎRA TORÊ

*Hilkişîme çûme jûrê her dû rex min bend û rez*
*Min dî pîrek tê ji tore ker di ber de tê bi lez*

*Hate nêzîk roj bi xêrek da û weke min dil bixem*
*Pîre bî bû porspî bû taqîreş bû rû gewez*

*Min ji pîrê xweş dipirsî ey metê tû ji kû ve tê*
*Go ji Sêrê diçime Bêrtê xûniya Romê me ez*

*Xan û eywan kirne wêran, mêr û jin ser jê kirin*
*Min go pîrê qey tû Kurdî? Çuye tilyên xwe bigez*

*Belkî benda rez, bi guhbit dengê xwe pir hilmeke*
*Pir ditirsim ez ji derbê singoyê Roma teres*

*Min digot axa û beg wê go kurê min guh nedê*
*Ew şivanin sermiyanin dane gur wan cûl û pez*

*Min kurek tenha heye ew şandî bajêr medresê*
*Wî dû sê pirs bo me gotin pê helandin cer û bez*

*Gotî dayê em dixwînîn wek Cegerxwîn gotiye;*
*Zû bixwînin hev bibînin biçne Kurdistan bilez.*

*Seydayê Cegerxwîn*

**LÊKOLÎN**

1- Cûdabûna di navbera berhemek wêjeyî yê hûnandî û pexşan de çiye? Vekin.
2- Hûn jî bi riya helbestekê hizirên xwe binin ziman?







## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Bê çavdêrîkirin çêkirina darîştinekê çiqas bitenduruste?
2- Ma mirov bê lêkolînekê baş dikare darîştinekê sazbike?

## 2- Pexşan

Cûrên nivîsînên weke; roman, serpêhatî, gotar, pêkenok, ceribandin, gotûbêj, hevdîtin, name, daxwazname, rexne, bîranîn û ... dikevin vî beşî.

**Mînak:**

### AMED KEYFXWEŞE

Ev heftiyeke, bi sedhezaran mirov, li ber bayê çand û hûnerê li ba dibin. Geh berbi Birca Bizinê ve, geh berbi Kûça hûnerê, geh berbi kolana Ben û Senê ve. Sêyemîn Mîhrîcana çand û hûnerê ya Amedê dibe dermanê serbirîna kaniyên hûnerê yên çikayî. Dibe sîwana çanda jibîr buyî.

Weke zanyar jî dibêjin: "Çav ti caran derewa nakin." Ez dihizirim çavên min, derewa nakin. Kurd pêşde diçin. Kurd wekî hespê qeyd û merbend qetandî, berbi ronahiyê ve dimeşin. Salên reş yên ku seza li tifika wan dihate birîn, bixwîna xwe ya li ser zozanekê cemidî derbas kirin. Ciwaniya azadiyê buye hesret. Her dilopek buye çiravek, her çiravek buye celalek, her celalek buye robare, her robarek buye Dîcle û Firatek; diherike nav wêjeya beyar. Diherike nav çand û hûnera stewr. Hinek rewşenbîr vê lêhiyê, weke ronansansê jî bi nav dikin.

Em neçar man, me navika xwe bi xwe jêkir. Piştî hezar salî, êdî gokek ya me ya Zêrin jî heye. Emê bi goka xwe bileyîzin û bi goka xwe şa bin. Li Kûça hûnêrê hûner, çîrok û ziman dizên; nezanîn ber tavêje ji hesûdiyê. Marks bi Kurdî riyên xwe yên demî şeh dike. Dîrok parastina xwe bi Kurdî dike. "Mamostayê herî mezin mejî, guh, çav û dilê mirove."

Me di vê mêhrîcanê de qêrîn û awazek bihîstin. Qêrinek dereng mayî, li Mêrg Ehmedê. Qêrinek weke pelpelistanekê li ser kitana dayîka şehîdan danî.

Lê kêzikên rîxê jî gav bi gav li pey mene, reng û dengên me dixin nav pencikên xwe yên rîxî, digindirînin nav sergûyên nijadperestî û kevneperestiyê.

Ameda xwe bi deng û rengê keç û xortên ciwan xemilandî, her ku diçe bilind dibe. Armanca wê ya sereke ewe ku di pêşerojê de mêhrîcanên hêj xweştir û bihêztir diyarî gelê Kurd bike.

## B- DARIŞTINA DEVOKÎ



Di vê beşê dariştinê de, nûtûq, konferans, rûniştina vekirî, di axaftinê de dijbertî, nîqaş, têgihandina waneyê û … cih digre.

**Ji Bo Axaftin û Nivîsandinek Baş û Bi Bandor Pêkbînîn, Xalên li Jêr Li Berçav Digirîn.**

### I- Çavdêrîkirin

Ji bo em bikaribin axaftinek bibandor pêşkêş bikin, yan nivîsandinek xweş binivîsin, pêwîste destpêkê em bibin çavdêrek baş. Çavdêrî ne meyzekirine, dîtine. Dîtin tê wateya dîtina cûdabûna her tiştê di xwezayê de. Çavdêrî, rast dîtin û rast naskirinê fêr dike. Ji bo tiştekê em baş têbigin, ji çavdêrîkina hemû cûrên nîşaneyên wê bi xwe derxistî hole re çavdêrî tê gotin. Ji bo tiştê me dîtî fêmbikin yan jî bidin fêmkirin, çavderiyê dikin. Piraniya mirovan xwe weke çavdêrekê dikarin bibînin, lê ev nikarin nivîsînek baş binivîsin yan axaftinek bi bandor bikin.

### II- Hizirîn

Ji bo nivîsîna mijarek xweş yan axaftinek bibandor, xalek girîng ya bê zanîn jî hizirîne. Di bingehê nivîsînê de, hizir radize. Berhemekê em dixwînin, di serê me de gelek hizran dafirîne. Di cîhana derve de, hemû hêmanên zindî û nezindî yên em dibînin, di serê me de hinek hizir û xiyalan zindî dikin. Girêdanên hemû têgehên razber û şênber yên weke; dîtin, bihîstin, xwendin û lêkolînkirinê, di kevin qada hizirînê de. Divê em hizrên xwe bi awayek balkêş û zindî danin holê. Hizirîn bi riya çavdêriya hindirîn tê bidestxistin. Yanî, çavdêrî dîtina ji der ve ye, hizirîn jî hindirê wê lêkolîn dike û dibîne. Bi awayek xwezayî her mirov xwedî hizirinekê ye. Lê belê hizrên ji hev cûda hene. Divê di navbera hizir û pilanê de girêdanek baş çêbikin. Mirov, ji ber neçariya dorhêla tê de dijî, neçare têgeh yan bizavên kes, derdor, civak, mijar, buyer û … bi awayek tendurust û biplan bihizire. Hizirînek belav û bêplan, girêdan û ahengiya mirov ya bi derdor û buyeran re asteng dike. Di vê rewşê de kesayetek xembar û neserkeftî derdikeve holê.

### III- Xwendin

Ji bo em bikaribin di derbarê zanistan de zanyariyan qezenç bikin û hêza xwe ya hizrî pêşbêxin, divê berhemên nivîskî yên weke; rojname, kovar û pirtûkan bixwînin û sûd jê bigrin. Di navbera kesên di xwînin û yên naxwînin de ciyawaziyek bi qasî reş û spî heye. Yek zanist û ronakbîrî, yê din jî nezanîn û taritî ye. Berî hertiştî, xwendin gencineya peyvan ya kesê dixwine, dewlemend dike. Di vê rewşê de karanîna peyvên bi hêjamar, wê nekaribe

hest û ramanan bi awayekê bibandor bîne ziman. Ji ber vê yekê, em baştir dikarîn hizrên nivîskar, helbestvan û hûnermendan têbigihin. Ji ber ku gencîneya wan ya peyvan dewlemende. Ji ber ew girîngiyên didin xwendinê û ew gihane wê baweriyê ku tişta herî baş ji bo mirovan xwendine.

Yekane rêbaza buyîna zanyar û rewşenbîr, xwendine. Ji ber wê, divê ji bîr nekîn ku raz (sır) a serkeftina di pêkanîna dariştinên nivîskî û devokî de, xwendine.

### IV- Baş Bikaranîna Zimanê Dayikê

Di roja îro de piraniya mirovan herî zêde bi çarsed-pênçsed peyvan daxivin û hevdû têdigihînin. Piraniya rewşenbîran dikarin di têgihandinê de kêmzêde sê-pênç hezar peyvan bikar bînin. Ev rewş, girêdayî baş bi karanîna zimanê dayîkê, weke kêmaniyek girîng ya civakî tê dîtin. Ji ber wê, pêwîste rewşenbîrên ku di civakê de pêşengî û rêvebertiyê dikin, bikaribin pazde-bîst hezar peyvan baş bikar bînin. Di ronahiya van rastiyan de, ji bo bikaribîn bi awayek baş û bandor baxivîn û binivîsîn, divê zimanê dayikê baş bizanîbin.

**LÊKOLÎN**

1- Çi ciyewazî di nabera dariştina devokî û nivîskî de heye?
2- Ji bo ku em dariştinekê birêk û pêk bikaribin binivîsin, pêwîste em çi bikin?
3- Li gorî we çima ji bo dariştinekê baş, baş zanîna zimanê dayîkê pêwîste? Şîrove bikin.






**1- Koka peyva “kompozîsyon (dariştin)” ji kîjan zimanê hatiye?**

a- Erebî
b- Fransî
c- Inglîzî
d- Elmanî
e- Farisî

**2- Ji yên li jêr kîjan xal di dema nivîsîna dariştinê de li ber çav nayê girtin?**

a- Binivîsin
b- Bixwînin
c- Destûrên ziman fêrbibin
d- Ji berê hûn binivîsin, bihizirin
e- Peyvên ne pêwîst, bikar neyînin

**3- Dema dariştin dinivîsîn, çend xalên sereke li ber çav digirin?**

a- 5
b- 8
c- 7
d- 6
e- 4

**4- Ji vebirakên li jêr kîjan ne yek ji xalên plana pêkanîna dariştinekê serkeftiye?**

a- Sergotar
b- Bi tixûbkirina mijarê
c- Naverok
d- Diyarkirina mijarê
e- Şirovekirina mijarê

**5- Dema em dariştinek dinivîsin, di aliyê awên de ji xalên li jêr kîjan nayê berçavgirtin?**

a- Pêwîste em navê xwe, navê refa xwe, jimara xwe û dîroka rojê li cihê pêwîst bicih bikin.
b- Pêwîste em armanca xwe û ramana xwe ya bingehîn baş diyar bikîn.
c- Divê sererêza paragrafê hinekî ji mal (1-2 cm) de destpê bikîn.
d- Pêwîste em asta çand û perwerdeya xwendevanên xwe li ber çav negirin.
e- Divê em navberên rêzên xwe ne zêde fireh û ne jî teng bikîn.

**6- Dema em dariştinek dinivîsin, di aliyê naverokê de ji xalên li jêr kîjan nayê berçavgirtin?**
a- Divê em hizirînên xwe li gor rêza eleqederî û girîngiyê rêznekîn.
b- Divê em li ser têgehên bingehîn yên mijara dariştinê saz dikin, rawestin.
c- Ger di nivisînê de beşên ne di cih de yan dûbare hebin, jê bavêjin.
d- Divê hewil bidîn ku peyvên di serê xwendevanan de zindîkirinê çêbike, bikarbînin.
e- Divê em ji riyên pêşxistina hizirinê (mînandin, beranberkirin, nîşandayîna bîner) sûd bigirin.

**7- Ji vebirajkên li jêr kijan endamek ya dariştina serkeftiye?**
a- Armanc
b- Sedem
c- Naverok
d- Pîvan
e- Serborî

**8- Ji yên li jêr kîjan ne xalek ya taybetmendiyên dariştinek serkeftiye?**
a- Mijar, divê berûvajî nirxên civakî be.
b- Mijar, divê balkêş be: Ger mijarek bala me nekişandî be, divê em afrêner bîn.
c- Şîrovekirin û teknîka şîrovekirinê divê em diyar bikin.
d- Mijar, divê hevsengê dewlemendkirina hest, raman û xiyalan be.
e- Mijar, divê vekirî, têgihayî û bibawer be: Mijarek ya ne bibawer, li ser wê mijarê nivîsandinek serkeftî nayê nivîsîn.

**9- Di nivîsînê de, ji hevoka armanca me diyar dike re çi tê gotin?**
a- Sergotar
b- Nêrîna kesî
c- Ramana bingehîn
d- Sojeya mijarê
e- Nêrîna bijartî

**10- Li gorî planê, dariştîn dibin çend beş?**
a- 2
b- 3
c- 4
d- 6
e- 9

**11- Ji bo axaftin û nivîsandinek baş û bi bandor pêkbînîn, ji xalên jêrî kîjan nayê bikaranîn?**
a- Baş bikaranîna zimanê dayîkê
b- Çavdêrîkirin
c- Hizirîn
d- Diyarkirina mijarê

e- Xwendin

**12- Ji mijarên jêrî kîjan nakeve nava mijara pexşanê?**

a- Serpêhatî

b- Daxwazname

c- Stiran

d- Bîranîn

e- Geryaname




## CÛRÊN DARIŞTINÊN NIVÎSKÎ YÊN PEXŞAN

### DAXUYANÎ

Di salên bûrî de me dariştin di aliyê rêzdarî, wergirtina cil û berg, rêkûpêkiya kes, mal û derdorê, têkiliyên di navbera kes, heval, bêjer û guhdaran de girtibû dest. Her wiha me girîngî dabû li ser axaftin, rêzdayîna axaftvan, guhdar û her kesê bi me re di nava têkiliyan de ye. Dîsa em li ser rexnekirina bêjer, guhdar û kesên li derdorê rawestabûn. Girêdayî van xalan me gelek mînakên devokî dabûn. Di heman demê de, bi awayekê devokî taqîkirinên mijarên weke; sempozyûm, rûniştinên vekirî, axaftinên dijber û ... hatibûn çêkirin. Her wiha hinek mijarên nivîskî jî hatine bidest girtin. Piştî bi bîranîna van xalên li jor, emê di vê pirtûka xwe de li ser cûrê nivîsînên wêjeyî rawestin û emê hewil bidin hinekan bi mînakên wan ve vekin.


| CÛRÊN DARIŞTINÊN NIVÎSKÎ YÊN PEXŞAN | |
|---|---|
| Name | Nivîsînên Geryaname |
| Daxwazname | Gotûbêj |
| Ramanî | Nûtûq |
| Gotar | Rapor |
| Taqîkirin | Roman |
| Nivîsînên Rexneyî | Serpêhatî |
| Bîranîn | Şano |
| Jîname | Hevpeyvîn |
| Çêrok | Pêkenok |
| Biwêj | Pendên Pêşiyan |

## NIVÎSÎNA SERPÊHATIYÊN KURT

**a- Nivîsîna serpêhatiyên kurt yên ku mijara wan bi xeta bingehîn hatî diyarkirin**

***Ji beriya nivîsîna serpêhatiya kurt, em van destûran bi bîr bînin:***

**1-** Divê buyer jiyan bûbe yan dibe jiyan bibe.
**2-** Serpêhatî, şêweyê vegotina buyerê ye.
**3**- Giraniya planê tevgere.
**4**- Pêwîste kes, ,dem û cihê buyerê, bi buyerê re, di nava ahengiyekî de bin.
**5-** Pêwîste ramana bingehîn ya serpêhatiyê bê diyarkirin.
**6-** Beşê destpêk, naverok, encam bi şêwayekî zanistî bê bikaranîn. Ji bo ku hertim balkêşiya xwendevan zindî bimîne.
**7-** Divê hest, hizir û endamên xiyal, waneyîkirin û danûstandinê neyên ji bîrkirin. Pêwîste di têgihandinê de zindîbûn, di hilbijartina peyvan de taybetbûn, li berçavan bên girtin.
**8**- Divê em di hevokê de, nekevin şaşîtî û bê biryarbûnê; divê şaşîtiyên rastnivîsîn û hêmadanînê neyên kirin.
**9-** Şêwaza tê hilbijartin dibe ku li gor mijarê sade, pêkenok, zarokî yan ji dil be.



**LÊKOLÎN**

Di derbarê serpêhatiya jêr de hinek agahiyên kurt hatine dayîn. Bi sûdgirtina ji van agahiyan, serpêhatiyekî kurt binivîsin. Serpêhatiya we nivîsandî, bi serpêhatiyek we hawêjkirî re berambar bikin, aliyên wê yên wekhev û yên newekhec hev diyar bikin.

**Yên tên dayîn**
1- **Cor:** Serpêhatî
2- **Mijar:** Serpêhatiya kesekî penaber
3- **Awayê vegotinê:** Çêkirina serpêhatiyê
4- **Ramana bingehîn:** Ji bo em bi rûmet jiyan bikin, pêwîste em berxwedanvan bin.
5- **Derdor (cih):** Li gorî mijarê cihek tê pêşnûmekirin.
6- **Dem:** Tevayî werzan bi taybet werza peyîzê bê hilbijartin. Di rojê de tevayî demjimêran dibe bê bikaranîn.
7- **Kes:** Ciwanekî bîstûçar salî, kur yan keç yê zanko qedandî, bê xwestin ciwanek ji derdor hilbijartî û zanko nexwendî jî dibe.
8- **Gotin:** Weke gotina sepêhatiyê dikarin demê bûriyê sade, bûriyê berdest, bûriyê çêrokî, bûriyê dûdar bipejirînin.

## B- Bi Dayîna Parçayekê Ji Zincîrek Ya Bûyeran, Nivîsandina Serpêhatiyekî

Di bin roniya zanînên we, yên di derbarê serpêhatiyekî kurt ya ku mijara wê bi xeta bingehîn hatî diyarkirin, dikarin serpêhatiya ji zincîra buyera, parçeyek hatî dayîn binivîsin.

### DAYÎK

Dayê Nûfel, xwe daye koşeyek ya xaniyê xwe yê kevnar û li keça xwe temaşe dikir, serê xwe dihejand : “ Xwezî min ev keça xwe rêkira gundekî.”

Çiqas banî keça xwe dikir, keça wê bersiv nedida, dixwest pêre şer bike, lê hêza wê ya şerkirinê nemabû.

Jixwe çend roj bûn, birqa wan tinebû, birqa wan heftiyê sê çar caran xiradibû, ger birq heba jî, ma gelo keçê tiştek dikir? Di odeya biçûk de findek pêketîbû. Mirov dikare bêje ji bo ronîkirinê, vê findê bikartanî. Nava odê tev sih bû, tarîtiya odê her wekû bandorê li xweşikbûna keçê dike, her êvar xeyîdîbû. Xwe wek di vî gund de dîl hatî girtin didît. Deriyê Mêrdînê dihat ber çavên wê, di xiyalên xwe de li riya şila dibiriqe ya nava Amedê temaşe dikir...

Lê di rastiyê de şiliya barana dibarî, li dîwarê ji kelpîçê axê hatî çêkirin re tavêt. Heriya nava kolana car car di derî re derbazî hindir dibû.

Li hember vê rewşê çavê wê tejî rondik dibûn, ji ber sala bûrî, di vê demsal û demjimêrê de ji parka Oxûr KAYMAZ dihat, pê re gelek xweştiviyên wê jî hebûn.

Ew roj derbaz bûn, ew heyîn bi dawî bûn, êdî Amed dûre. Pêwîste xwe li gor nû ketiyê amade bike, lê nedixwest Amedê ji bîr bike.

## c- Nivîsîna Serpêhatiyek Kurt Ya Ji Xwe re Hêlayî



Li gor di derbarê nivîsîna serpêhatiyan de zanînên we zêdebuyîn, ji nû ve, ji bo nivîsîna serpêhatiyên nû çavdêriyên xwe berdewam bikin. Heya niha zanînên we girtî, dibe ku bi we teknîka nivîsîna serpêhatiyê dabe qazanckirin, lê belê nivîsînên me di mijarekê de nivîsandîn, ger ji aliyê hinek din ve hat pejirandin û xwendin, wê demê dikarin xwe serkeftî bibînin. Ji ber vê, pêwîste hertim xwe di nava çalakiyên xwendin û nivîsînê de bibînin.

Ji bîr nekin; bi xwendin, guhdarkirin, şopandin û di nava buyeran de jiyankirin, şopandin û hizirînê, şarazayî tê qazanckirin. Ji vê pêvajoyê re, dikarin bêjin pêvaoya "dagirtî". Axaftin û nivîsîn darêjandineke. Ev herdû pêvajo heta dawiya jiyanê berdewam dikin. Ger ne wisa be, hest, hizir û cîhana me ya xiyalan, wê bi demê re teng bibe, hêza girtina me wê bikeve û şarezahiya me wê kevin bibi; bi kurtayî wê pêşketina me raweste. Ev rewş wê rê li ber binketina têkiliyên di nava kesan de veke. Dê bibe sedem ku em bibin kesek ez ezî, bes rûmetê bidin ramana xwe û bibin kesekî ne li hevkirî û bê têgîn. Kesê ketî vê rewşê, ji nav civakê berbi tenêtiyê ve tê dehfdan û bê gêwil dibin.

Jibo em zanînên xwe zêde bikin û pêşketinên çêdibin di nava xwe de bihelînin, pêwîste hertim bixwînin û ji bo xwe vegotin bikin. Di nava rêkûpêkiyek diyar de xebatên xwe yê xwendin û nivîsînê berdewam bikin. Li milekî serpêhatiya xwe binivîsin, li milê din pêwîste pirtûkên me xwedî hizirîna me vedikin û cîhana me ya xiyalan hertim fireh dikin.

Ev hewildanên xwendinê pêwîste di salên zankoyê û pêşerojê de bidome. Her berhemekî nû em bixwînin, weke di çêkirina serpêhatiyê de, hin zanînên nû didin qezenckirin. Di beşê din yê wêjeyê de jî, hêza şîroveya me ya bi bandor zêde dike.

### PÊKANÎN



**Ji mijarên jêr yekê hilbijêrin, serpêhatiyek kurt binivîsin.**

1- Goşt ji te re, hestî ji min re.

2- Kesê hingivî digirin, tiliya dalêsin.

3- Kesê hingivî bixwe mêşê pêve bidin.

4- Pîr bike, lê ji bîr neke.

# SAZKIRINA KURTENIVÎSÊN RAMANÎ

1- Nivîsînên Ramanî
2- Nivîsînên Gotarî
3- Nivîsînên Taqîkirin

Di waneyên beriya niha de, bi riyên çespandin û diyarkirinê awayê vegotinê hatibû dîtin, corên ketibûn vê riyê, hatibûn têgihandin, plana giraniya wan hizirîn, çawa çêdibe, di vê planê de, ji çi re cih hatiye dayîn, fêr bibûn.

Bi alîkariya zanînên me ji vê beşê girtîn, emê hewil bidin ku nivîsandinekî kurt binivîsin.

## Nivîsînên Ramanî



We agahiyên di derbarê vegotin û corên lihevhatî yê di mijarê de diyarkirî û agahiyên di derabrê corên fikrayê de girtin.

Ramanî, ya weke nivîsînekî hizrî, corenivîsîneke di rojnameyên rojane de, di stûnên diyar de cih digirin. Weke buyerekî rojane tên şîrovekirin. Nivîskarê fikreyê mijara hilbijartî bêyî ku bikeve nava belavbûnê, dinivîsê. Her mijarên ku balkêşî di wan de heyî yên weke, ramanî, civakî, pîşeyî, di mijarên aborî de, di qada werzîşê de, bi kinahî mijarên buyerên rojane û balkêş tên nivîsîn.

Di welatê me de nivîskariya fikrayan qadek ya pîşeyî ya taybet û balkêşe. Di welatên biyanî de, nivîskarên her roj nivîsînê didin rojnameyekî nînin.

Nivîsîkarên fikrayan, nîvîsînên xwe bi awayê pêkenok, balkêş, zindî, tinazok, kîn..... dinivîsînin.

Ji ber ku fikra hertim di rojnameyan de, di demek dirêj de berdewam nakinbi awayek balkêş û asayî tên têgihîştin û ji corê nivîsînên din tên cûdakirin. Di welatê me de, nivîskarên fikrayan yên pir serkeftî dê çêbibin. Di beşa serî ya fikrayê de mijar, di beşa vekirinê de di derbarê mijarê de hizir, şîrove, rexnekirin... datîne holê, di beşa dawî de darezandin yan jî pêşniyar cih digirin.

**Ji bo nivîsîna fikrayê riya bê şopandin eve:**

1- Mijarekî balkêş ya ku hûn nivîsandinekî li ser binivîsin hilbijêrin.
2- Mijara xwe bi tixûb bikin.
3- Armanca nivîsîna xwe diyar bikin.
4- Ramana bingehîn danin holê.
5- Pêwîste we ramana alîkar ya ku destekê dide ramana bingehîn, amadekiribe.
6- Hûn dizanin pêwîste plana giraniya wê hizrî çêbikin. Zanînên we komkirî di plana xwe de bi cih bikin.
7- Erê dikarin fikraya xwe binivîsin, dikarin her ramanekî alîkar weke paragrafekî nîşa bikin.

## KERO

Zilamek hebû navê wî Kero bû. Kero, mezin bû, şeş - heft kurên wî çêbûn, dewlemend bû. Kurê Kero bû keyayê gund. Kurên Kero dixwestin navê bavê xwe biguherin, lê şerm dikirin ji gundiyan re bêjin. Her wiha gundiyan jî dixwest navê bavê keyayê xwe biguherin, wan jî şerm dikirin ji kurên wî re bêjin.

Lê rojekê kurên Kero li hev civiyan û biryar dan ku navê bavê xwe biguherin. Li ser awayê guherînê cure kirin. Pişt re gihan biryarekê û gotin: “Emê şeş - heft pezan bigurênin, banî gundên derdor û gundiyên xwe bikin, bi vî rengî emê zêwek (ziyafet) mezin çêbikin, di wê zêwê de emê navê bavê xwe biguherin.” Kurên Kero şeş - heft pez gurandin, xwarinên cûrbecûr çêkirin, weke hatî plankirin hêjmarek zêde ya mirovan ji bo xwarinê kom bibûn. Berî dest bi xwarinê bikin, kurê Kero dest bi axaftinê kir: “Hevalno, bi armanca em navê bavê xwe bigurin me ev zêw amadekir û me xwest di vê zêwê de em navê bavê xwe yê ku jê şêrm dikin, biguherin.” Li ser gotina wî, yekê gundî jî rabû û got: “Me berê dixwest em vê ji we re bêjin, lê me ji camêriya we şerm dikir. Biryarek gelek di cih de ye.” Li ser wê yekê curekirin dest pê kir. Hinekan; em navê wî bikin şêr, hinekan; em navê wî bikin piling... Pişt re yekê gundî rabû û got: “Em dixwazin ew bi xwe navekê ji xwe re hilbijêre.” Kero mafê axaftinê girt û got: “Navê min bikin Gawo.”


Li ser vê gotinê kurê Kero bihêrs bû û got: “Yabo tû xwe ji êfir xilas nakî.” Di nava Kurdan de jî, kesayetên ku her kes dibêjin em navê we ji kerîtî danin, dibêjin navê me bikin Gawo. Yanî dema dixwazin ji Ereban rizgar bibin, xwe tavêjin himbêza Tirkan...

*MûsaEnter*

## LÊKOLÎN

1- Ji bo nivîsîna fikrayê hûn fêrî awayê vegotina tê xwestin, zanînên di derbarê cûrenivîsînê de û çêkirina planê bibûn. Li gor van fêrbûnên xwe, li ser buyerekî bala we kêşandî, fikrayekî binivîsin.

2- Wateya fikreyê lêkolîn bikin.



## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Ger gotar pal nede delîlekê mîsoger, dikare weke gotar bê pejirandin?

2- Çima nivîskarê gotarê neçare tiştên rast û bibawer ji xwendevanên xwe re bide diyarkirin?

# GOTAR



Weke tê bîra we, gotar nivîsînek ya diyarkirin û mîsogeriyê ye. Agehîdayîna di mijarekê de, destekirina nêrînekê yan jî nivîsînekê, bi armanca daxuyaniyekî hatî nivîsandin, ji van nivîsînên di wan de diyarkirin û mîsogerî heyî re **gotar** tê gotin.

Gotar, ji cûrenivîsînên biplana giraniya wê bihizirînê hatî nivîsîn, ya herî girînge. Di gotarê de ramana bingehîn, hizrekî bi xwendevan dayîna pejirandine. Ji ber vê sedemê, pêwîste gotar bi awayekî bê bawerkirin be. Ji bo ku bê bawerkirin riya yekane têgihandina rast, sade û bêxaza ye. Nivîskarê gotarê, ji bo nêrîna xwe bide pejirandin, dikare sûd ji îstatîstîk, şopandin, taqîkirin û têbinîgirtinê bigire. Dikare ji tevayî hatin yan berbi tevayî ve çuyînê bingeh bigre.

Gotar di kovar û rojnameyan de tên nivîsîn. Di gotarên rojnameyan de, piranî mijarên rojane tên nivîsîn.

Dikarin ji pîşe heta konevanî, aborî ta leşkerî, çandinî ta perwerdê; li ser her tişta bê bîra we, gotarê binivîsin. Nivîskarê gotarê, bi armanca zanekirina gel û di rasteka nêrînekê de, avakirina raya giştî bingeh digre.

Gotar li gor armanca li jor me dayî diyarkirin, pêwîste bi zimanekî xwerû û vekirî bê nivîsandin. Bi taybet gotar bangî xwendevanên rojnameyê dikin. Dema gotarê dinivîsîn, dibe taybetmendiyê xwendevanan li ber çavan bigirin. Nivîskarê gotarê pêwîste ji tiştên hestyarî bireve.

Pêwîste agahiyên di gotarê de tên dayîn, pala xwe bidin jêderek rast. Nivîskarê gotarê yê ku xwendevanê xwe şaş têbigihîne, dibe ku bibe sedema encamên buyerên bi êş. Ji ber ku xwendevanên bi gotarê bawer, bibawerî û ji diliyek mezin gotarê dixwînin. Di beşa destpêkê ya gotarê de, mijar tê diyarkirin, îdîayê tavêjê holê. Di beşa vekirinê de, hewil dide ku bi pelge û zanînên hatîn lêkolînkirin û hatîn bawerkirin, bi nêrînek mîsoger mijarê bide bawerkirin. Di beşa encam de mijarê bi darezandinekê ve girê dide.

## Taybetmendiyên Gotarê

**1- Vegotina wê xwerû û dagirtiye, xwedî kêrhatinek şênbere.**
**2- Tez û ramanên ku tên pêşkêşkirin, tên piştrast kirin.**
**3- Serî li leyîstokên peyvê nade û ji têgihandinekê xemilandî dur radiweste.**
**4- Dikare li ser her mijarê gotar bê nivîsandin.**
**5- Di rojname û kovaran de tên weşandin.**
**6- Piranî gotar bi awayekên kurt û bicewher tên nivîsandin.**



### Di Nivîsandina Gotarê de Ev Xal Li Ber Çav Tên Girtin

- Ger têgihandina wê sade û ahengî rêkûpêkiyek diyarbe, baştire.
- Taybetmendiya şênber di plana pêşî de ye.
- Divê tez û ramana tê pêşkêşkirin, bê piştrast kirin.
- Di nivîsandina gotaran de mijarek diyar nine. Nivîskar dikare di derbarê her mijarê de binivîse.
- Di rojname, kovar û înternetê de tê weşandin.

## Mînaka Gotarê:

### DI GIRÊ SPÎ DE RÊGEZ Û MIROVAHIYÊ QEZENÇKIR



Piştî serhildana Gezî û serkeftina 7'ê Hezîranê bi heftiyekê, berxwedana leşkerî li Girê Spî giha serkeftinê. Kantona Cizîr û Kobanê bi hev ve hatin girêdan. Ev, şoreşekê serekeye. Tevayî awayê berxwedanê di nava hev de sentez dike.

Ji roja destpêka PYD'ê destbi şoreşa her sê Kantonên Rojava kirî, di her sê Kantonan de jî xwest mafê Ereb, Tirkmen û xweseriya wan nas bike û hemû gelan bi hev du re bibe avakirinekê demokratîk. Heta hinek nivîskaran gotibûn; "Ji bo parastina Kantonan, ev xetên Erebî yên di nava Kantonan de bêne dagirkirin. Ev ji bo parastina Şoreşa Rojava neçariyek leşkeriye." Li hemberê vê PYD'ê; "Ji ber pêkhateya neteweyek demokratîk û exlaqê mirovhez" vê neçariya leşkerî red kiribû. Di vê nivîsandina xwe de PYD'ê gotibû; "Ev biryara me di aliyê leşkerî de şaş, lê di aliyê exlaqî de raste."

Di roj, heta mehên destpêkê de, dikarî her dû xetên mijara gotinê bêyî ku rastî berxwedanê were, desteser bike. Lê PYD neket vê riyê. Xwest gelên van cihan bi daxwaza xwe şoreş û serkeftina Rojava hilbijêrin. Lê dewleta Tirk û DAIŞ'ê nehêlan ku gelên Ereb û Tirkmen bi vîn û taqikirinên xwe tevlî şoreşa Rojava bibin. Ev her dû herêm, bi alîkariya hukumeta AKP'ê rasta dagirkeriya DAIŞ'ê hatin.

Şoreşa dibin pêşengiya PYD'ê de ya ku dixwest şoreşê bi riyên aştiyane bibe serkeftinê, hindik mabû bibe qurbana nêzîkatiyên xwe yên "exlaqî". Ji ber vê çendê Kobanê hat rewşa "ket ha bikeve" de. DAIŞ'ê karî Kobanê bi her çar aliyan ve dorpêç bike. Bi hezaran şervanên YPG û YPJ'ê gihan şehadetê. Niha serkêşê dewleta Tirk û berdevkê hukumetê li hemberî ev qas rastiyan, li pêşberî tevayî cîhanê dibêje; "Girtina Girê Spî, planek ya YPG û YPJ'ê ya koçberkirina Ereb û Tirkmenane." Yên durû dabaşa trajediyên di şer de hatîn jiyankirin dikin. Ev durû, bi awayek bê ar, aramî û parastina gelê Tirkmen û Erebên vê herêmê ya beriya hatina DAIŞ'ê mandêl dikin. Ger şoreşa Rojava li dijî rêgezên xwe îxanet bikiriba û beriya çend salan Girê Spî girtiba, DAIŞ'ê gav netavêt vê derê, Kobanê dorpêç nedikir, talan û wêran nedikir û Kobana hilweşandî nedibû gola xwînê.

Carna "rêgez" şoreşê têxin zorê. "Girêdana bi exlaq û rêgezan ve", di pêvajoya şoreşê de dibe sedemê windakirina teqtîkî. Lê belê, ger vîna şoreşgerî hebe, ti cara "rêgez" li ser pişta şoreşgeran nabe bar. Şoreş tenê ne bi çekê, bi rêgezan rêve diçin. Ji xwe encam serkeftina "rêgeza"ye. Niha wê ev nêzîkatiya "bi exlaq û rêgez" gelên Ereb û Tirkmen yên di navbera

kantonên Rojava û di bin destê DAIŞ'a neyarê mirov, jin û xwezayê de asê mayî, rizgar bike û wê berê vî gelî bide cîhanekê nû.

Em dikarin bêjin, serkeftina Girê Spî wê bi van taybetmendiyên mirovî re, rê li ber encamê konevaneyek pir mezin veke. Pêvajoya leşkerî ya şoreşa Kurdistanê, bi vê serkeftinê re bilez ber bi xala herî dawî ve pêşdikeve. Ger bi Tirkmen û Erebên di navbera van her dû kantonan de li ser bingehê netewa demokratîk pêkwere, wê ev pêşketin bikêrî bidawî anîna şerê Surye jî bê û derfetên rawestandina şer bafirîne. Bêguman gelê Suryê wê biryara di derbarê vê rejîmê de bide. Li kîjan alî biryar bidin, bila bidin; diyare gelê Suryê wê ji vî şerî waneyek mezin derxe û wê gelê Heleb, Lazqiye û Şamê bi kantonan re di nava "pir-rengi"yê de yekîtiyê pêkbînin. Wê rêgeza "Konfederalîzma demokratîk a Rêber Apo" gelên Rojhilata Navîn ji şerên nijad, ol û mezhebî rizgar bike.

Ya herî girîng, şoreşa Rojava ya ku yek jî qeyrana sereke ya Rojhilata Navîne, roja bigihe serkeftinê, êdî wê hêzên desthilat nikaribin tiliya xwe bixin nava karê gelên Rojhilata Navîn.

## LÊKOLÎN

Li ser mijarekê bala we kêşayî ya hûn bikaribin li ser bixebitin, gotarekê binivîsin. Ji ber vê, destpêkê ji agahiyên xwe yên di derbarê gotarê de sûd bigirin, hûnê çi bikin, biryar bidin. Plana xebata xwe hûn bi xwe diyar bikin, yan jî riya li jêr hatî diyarkirin bişopînin.

1- Mijarekê bala we kêşayî hilbijêrin û bi tixûb bikin.
2- Di derbarê mijara xwe de lêkolîn bikin.
3- Ramana xwe ya bingehîn diyar bikin.
4- Plana gotara xwe amade bikin.
5- Di çarçoveya plana xwe de gotara xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Gelo hûn ciyewaziyek di navbera taqikirin û gotûbêjê de dibînin?
2- Di taqîkirinê de çavlêkirin dibe?

## TAQÎKIRIN

Nivîskarê di mijarekê de, hest û hizrên xwe berî ku here darezandinekê, bi têgihandinek hundirîn û taybet dinivîse, ji vê cûrenivîsînê re **taqîkirin** tê gotin.

Taqîkirin jî weke fikra, gotûbêj û rexnekirinê, ji cûrenivîsînên giraniya wê hizirîne. Di fikrayê de buyer, li derdora buyerekê kom dibin. Di gotûbêjê de ji bo xwendevan, têgihiştinek weke denglêkirinê tê hilbijartin û pirs tên kirin. Ji pirsan re bersiv tên dayîn. Gotûbêj, te dertêxe pêş. Di rexnekirinê de digihîne encam û darizandinekî. Kes yan berhemê  mijara rexnekirinê jî, bi riyên cûrbecûr tên ravekirin, nirxandin û diçe darizandinekê.

Nivîskarê fikrê, ji gotûbêj û rexnê cûda, taqîkirinê jî dinîvîsê. Xwe dertêxe pêş, dabaşa xwe dike, xwe bi yekî din re tîne berhev û aliyên cûda datîne holê. Nivîskarê taqîkirinê, dabaşa guman, şabûn, hêrsbûn, nêrîna wî/ê ya li Cîhanê ya ku wî/ê ji kesên din vediqetînê, dike.

Dema vê dike, armanc ne ewe ku ji xwe pir hezdike. Nivîskarê taqîkirinê, serbixwe, azad, taybet, bêşert û merc ji têgihandinekê bê mukurî sûd digre û dixwaze bigihe xwendevanan. Ger gotin di cih de be, di taqîkirinê de ji min destpedike, dixwaze bigihe me.

Nivîskarekê serkeftî yê taqîkirinê, pêwîste nêrîna wî ya li cîhanê fireh û xwediyê wêjeyekê dewlemend û hunerê çandî be. Lewra taybetbuyîna vî berhemî, girêdayî vê ye. Nivîskarê taqîkirinê, mijara digire dest, cara yekê bi nêzîkatiyekî nû, bi awayekê cûda têdigihîne. Azadbûna di taqîkirinê de, vê riyê çêdike. Hevokên taqîkirinê rast, vekirî, sade, berdewam û zindî ne.



**Ji bo em taqîkirinekî binvîsin, riyên li jêr hatî pêşniyarkirin dikarin bişopînin.**

**a-** Li gor mijara we bijartî, ramanekî binehîn diyar bikin.
**b-** Di derbarê mijarê de, nêrîna xwe ya taybet binivîsin.
**c-** Hizirînek ku van hizirînan rêz bike, bafirînin.
**ç-** Bêyî ku em bikevin gumanan, tişta hatî bawerkirin, weke ji xwe re baxivin, bi têgihandinekî vehês dinivîsin.
**d-** Hevokên xwe ji çavlêkirinê dûr, bi awayê têgihiştî û balkêş binivîsin û hewil bidin ku peyvên taybet çêbikin.
**e-** Ji bo balkişandinê be jî, pêwîste bikaranîna peyvan di aliyê wate û awên de xiranekin.
**ê-** Ji awayê xwendevanê we tênagihê, ji taybetiyên ku xwendevan ji nav dernakeve birevin. Biwêjên her kes bi kartîne, waje, hevtemamkirin û birepeyvan bikarbînin.
**f-** Hewil bidin taqîkirina xwe bi hevokekî balkêş dawî lê bînin.

## Mînaka Taqîkirinê:

### GIRÎN

Girî û ken cêwîne. Girî, weke tê gumankirin ne bêçarebûn, lewazbûn û bêhêz bûne. Belkî pir balkêşbe, lê dema ez kesekê digirî bibînim, li gel xemgîniyê hinekê keyfxweş jî dibim. Ji ber ku dema kesek bikaribe xemgîn bibe, weke wê dikare hezkirinê jî pêkbîne. Mirovekê bikaribe bigirî, hê bêhtir kenînê fêmdike.

Dizanim ku kesê digirî dilê wî hê qirêj negirtiye. Dilê wî hişk nebuye, hestên wî xilas nebûne. Dibêjin; "Dil negirî çav hêstir nake..." Aha tiştek wisaye... Dema dilşadibîn, ji ber dilşadiya xwe çawa bi dengekê bilind dikenin! Di xemginiyê de, rondikên tên rijandin jî ew qas binirxin. Li şûna em xwe bi hêrs û qure bikin, xwe bi hestên tolhildan û nefretê dagirin, dilê xwe gemar bikin; em bi rondikên çavên xwe kela xwe verêjin hîn rastire. Dibe ku rastiyê nenirxîne, lê... dibe buneya ku dilê me bi peydakirina agirê rast nerm bibe.

Dema em kesekê digirî bibînin, jê re gotinek xweş gotin, li rex rûniştin yan jî raberkirina destmalekê, alîkariya herî mezine. Ev, ji hezar cûrê gotin û nêzîkatiyan girîgtir û hêjatire.

Li gorî min girîn, pêwîstiyeke ku mirov dike mirove. Weke hemû dijberên di gerdûnê de, girî û ken cêwiyên ku ger nebe nabine.





**LÊKOLÎN**

1- Ji van mijarên jêrîn yekî hilbijêrin û li ser taqîkirinekê binivîsin.
"hezkirin, dostbûn, cûdabûn, tirs, rastî, virkirin, baş hizirîn, tevlihevî, ciwanî, kalbûn..."
2- Taqîkirin çi dertêxe holê? Lêkolîn bikin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- We carna name nivîsîne?
2- Beşa herî girîng ya nameyê kîjane?
3- Peyvên rêzdariyê li ku dera nameyê tên bikaranîn?

## NAME





***Name, cûrenivîsandinek ya pêkanîna ragihandina di navbera dost, heval û saziyên fermî de ye. Di nameyan de ragihandina daxwaz û xwestekan, bi riya hest û ramanan pêktê. Şêweyê pêkanîna têgihandina nameyan, li gor asta çanda kesê jê re tê rêkirin, tê nivîsîn. Zimanê nameyên ku ji hevalê xwe re rêdike, divê bizimanekê sade, ciyewaz û hevgirtî binivîse. Name, cûrnivîsandinek wêjeyî ye. Di heman demê de amêrek ya ragihandina hest û daxwazane.***

## CÛRÊN NAMEYAN

**Name bi çar beşan tê dabeşkirin:**

### 1- Nameyên taybet

Nameyên heval, dost û evîndariyê; nameyên serxweşî, spasî, vexwendin, pîrozbahî û têlgraf ji cûrên nameyên taybetin.

### Mînaka Nameyê:

## Ji Serokatiya Partiyê re

Ez di sala 1972'an de, li navenda bajarê Meletiyê hatime dinyayê. Navê min Zeyneb KINACI ye. Ez bi eslê xwe ji gundê Elmalî ku girêdayê navenda Meletiya yê me. Navê eşîreta me Mamûrkî ye. Min li Meletiyê, li Zankoya Unonu beşê rêhberî û şêwirmendiya psîkolojiyê xwendiye. Berî ku ez beşdarê nav refên tevgera netewî bibim, min li nexweşxaneya Meletiyê weke teknîsîyeneke rontgenê kar dikir. Ez zewicîme û hevserê min ji Amedê, navçeya Egilê, gundê Xiliyane. Ew jî ji heman beşê Zankoyê mewzûne. Hevserê min di zivistana 1995'an de, li bajarê Edenê, dema xebata Eniyê dikir, dîl ket destê dijmin. Ji aliyê aborî ve rewşa malbata min asayî ye. Bi tixûb be jî, ez hinek serbest mezin bûm. Dema min hîn di Amadeyî de dixwend, bîr û barweriya çep û Kurdayetiyê bandora xwe li ser min kir. Min di van salan de dest pê kir û bi çavekî rexnegirî li jîyanê mêze kir. Lê, ez nêzîkî ti hêzekî sîyasî nebûm û neketim nav xebatê. Dema min li Zankoyê dixwend, dîtîn û meyla min a çepîtî hîn zelaltir bû û sempatiya min ji PKK'ê re zêde bû. Malbata min her çiqas paşvemayî bû jî, lê hestên Kurdperweriyê diparast. Ji ber vê yekê aliyê minê Kurdperwerî li pêş bû. Wê demê li herêma me hêz û derdorên welatparêzan ne bi rêxistin bûn. Pêşengî tine bû. Dîsa rewşa malbata min ya aborî bû sedem ku ez hinekî li paş bimînim. Di nav demê de dîtina min xurt û zelal bû û dawî ez ketim nav refê têkoşînê.

Di sala l994'an de, li bajarê Edenê min di nav Eniyê de dest bi xebatê kir. Bi qasî salekê min xebata xwe domand. Di perwerdehiyeke xurt re derbas nebûm. Herçiqas min dixwest jî, lê ji ber sedemên ku kesên rêveberiyê paşê hatin girtin, wernegirtina desteka pêwîst çênebû. Hem bandora kesayeta sivîl ya li ser min hem jî nekarîna min ya guhertina kesayetiyê, pêşneketim û nebûm xwedî serkeftin.

Di sala 1995'an de, li herêma Dersimê ez beşdarê nav refê ARGK bûm. Di nav refên ARGK'ê de min ji serî heta binî jîyana xwe li ber çav derbas kir û kesayeta xwe naskir. Di kesayeta min de serwextî û têgehîştineke pêşketî çêbû. Ez dikarim bêjim ku ji aliyê biryardarî, gêwil, zelalbûn û zanabûnê ve bi hêztir bûm û pêşketim.

Tekoşîna me ya di pêşengiya PKK'ê de her ku çû xurt bû, ji hemû mirovahiyê re bû mal û ji gelên bindest re, di rêya sosyalîzmê de bû hêvî. Ev gelê me yê ku bi tevahî hatibû

mandêlkirin û bê kesayetkirin, di dîrokê de cara yekem serbilind û serfiraz bû. Her wiha ev gelê ku nirxên wî yên netewî, giyanî, çand û nasnameya wî hatibûn mandêl û tinekirin, ketibû bin destê dijmin; bi vê têkoşînê, carekê din hişyar bû û zane bû. Ew bû xwediyê wêrekî, qehremanî, zanebûnê û berpirsîyariyeke mezin hilgirt ser milê xwe. Ev gelê ku ji hestên nîştîmanperweriyê dûr, ji dijmin re stûxwar û bendewar, bê ax û welat, ji aliyê zordestên dîrokî ve hatiye hêran, pelixandin û çewisandin, heta îro pêşeng û ronakbîrên xwe yên rastî dernexistibû holê... Nîştîmaneke xerabe û wêran mabû.... Damezrêner û serokê PKK’ê Serok Apo, vê rewşa berevajî û nerênî ji binî ve guhert. Gelê Kurd ne bi tenê bê nasname bû, her wiha mêjiyê wî jî, ji bo dagîrker û karbidestan dixebitiyan û ketibû xizmeta hêzên paşverû û emperyalîst. Wî, gelê Kurd ji vê xewa mirinê hişyar kir, rakir ser pîyan û ne ji bo bîyaniyan, ji bo wê xist nav têkoşîn û şerê azadiyê. Helbestvanê Kurdê mezin Ehmedê Xanê digot ku: “Heger serokekî me yê durist û birûmet hebuya, dê em jî nebûyana dîlê Ereb, Ecem û Tirkan. Serokên Kurdan yên sexte heta niha berjewendiyên xwe yên kesî, malbatî û eşîrtî dane pêşiya yên gel û di dîroka Kurdistanê de vê rewşa lanetbuyî demeke dûr û dirêj heta niha domandine. ”

Mirov dema li dîroka her neteweyekê dinêre, bi taybetî dîroka şoreşa wan dikole, rastî serokên wan yên ku di riya rizgariyê de rola xwe ya mezin lîstine û tekoşîn kirine, tên. Dîrok hem ji bo bizavên rizgarîxwazên netewî hem jî, ji bo yên çînî baş dide dîyar û zelal kirin ku bê serokatî ew rizgar nebûne û bi ser neketine. Serokatî, di warê nûbûn û pêşketinê de, di pileyekê bilind de nûnertiya tevahiya bizavê dike. Serokatî ji bo mirovê nû, dîtina nû, civata nû hemû jîyana xwe terxan û pêşkêş dike. Jîyana xwe li gor jîyana gel pêktîne, çarenûs û serkeftina xwe di çarenûs û serkeftina gel de dibîne. Ew daxwaz û hêviyên gel di kûrahiya mêjî, dil, giyan û laşê xwe de pêdihese û bicih dike. Ew, ji bo rizgariyê erk û berpirsîyariyan di pileyeke bilind de digire ser milê xwe û pêk tîne.

Ji gelê me re mafê jîyaneke rastî nemaye, ji her alî ve hatiye qedandin û qelandin. Li cîhanê ti gel weke wî ji rastiya xwe nehatiye dûrxistin û ji xwe re nebuye biyanî. Nirx û hêjahiyên wî yên netewî, çandî, civakî nehatine mêtin... Li hember vê rewşê helbet pêwîste ku Serokatiya PKK’ê ji yên din cudatir be. Di vê rewşê de Serokatiya Partiyê ji her aliyê ve û bi taybet, bêhtir nûvejen, jîndar û pêşketî be û jiyana xwe bi tevahî ji şoreşê re bike gorî û bikeve xizmeta gel. Bi rastî jî, PKK û Serokatiya wê, xwediyê van taybetiyên jorîn in.

Dema mirov li dîroka şoreşên cîhanê dinêre, hem gelên ku şoreşên netewî û hem jî yên çînî pêk anîne, ew xwediyê gelek derfetên dîrokî, civakî, çînî û çandî bûne. Mandêlkirina wan a netewî tine bû. Pirsgirêkên wan ên kesî ne wek yên me mezin, hûr û kûr bûn. Dîroka wan ne weke ya me hatiye têkdan. Jinên wan ewqas jêrdestî, bindestî û çewsandin nedîtine û paşketî nemane. Dîn, biqasî di nava me de xirab hatî bikaranîn, di nav wan de nehatiye bi karanîn. Ew gelên din li gor rewşa xwe li dijî dijminê xwe bertek nîşandane. Di nav wan de kêm be jî azadî û wekhevî hebû. Serok û pêşengên wan kêm be jî, ji ronakbîr û xwendekarên xwe gelek piştgirî û alîkariyê dîtine û girtine. Di şoreşa Kurdistanê de ev taybetiyên hatin destnîşankirin bi tevayî nemabûn.

Serokatiya Partiyê ji rastiyeke gelek jar derketiye rê. Dîtin û nêzîkbûna wî ya li ser pirsên ol, jin, kesayet û malbatê gelek bi zanistî û di cihê xwe de ye. Serokê şoreşa Rûs Lenîn, bi

xwe di pirsa jinan de, çareseriyeke têr û rast ne aniye ziman û holê. Damezrandina artêşa jinan, pêkanîna Kongre û Konferansên Jinan li cîhanê bi tenê di dîroka şoreşa me de hene û di pratîkê de pêk hatine. Rengê jiyana serokatiyê, kûrahî, hişmendî, helwestgirtin, pêşdîtin, hêz û hunermendiya axaftin û şîrovekirinê; durustî, tecrûbe û zanabûna zanistî ku di kesayeta serokê me de hene; mirov nikare bi ti serokekî din re berambar bike. Li buyeran doxmatîk nanêre. Serokatiya me, rastiya Kurdistanê, şoreşên cîhanê baş analîz kiriye, encam û wane ji wan derxistiye û derdixe. Li ser vê rastiyê, hîmê şoreşa Kurdistanê avakiriye. Ne bi awayekî teqlîd, kopya û doxmatîk, heta tû dibêjî bi awayekî afirêner ji wan wane û tecrûbe girtiye. Sosyalîzmê pir baş analîz kiriye, li gor merc û hoyên gelê xwe encam jê derxistiye û niha jî bi awayekî zanistî di jîyana pratîk de ew bi kar aniye û bikar tîne. Her wiha PKK di kesayeta serokatiyê de xwe rave kiriye û rave dike.

Ev pêşketinên ku di dîroka Kurdistanê de çêbûne, berhem û encama keda Serokatiyêne. Ew bi xwe serkaniya evîn, hevgirtin û yekîtiyê ye. Di kesayeta xwe de, profila mirovekî nû çêkiriye. Wî daye îspatkirin ku mirovek dikare çiqas xwe nû bike û pêş bêxe. Îro pêdivî û durişma şoreşa Kurdistanê "Em ji bo serkeftin û azadiyê bikevin nav refên hêzên partiyê, artêşê û eniyê" ye. Ev durişm, hemû pirsên talî û biçûk dide aliyekê, rastiya rewşa gelê Kurd û ya dijmin bi awayekî zelal û berbiçav li ser bingeheke giştî tîne holê. Ji vir û pê ve; hemû gelê Kurd û bi milyonan mirov bi dilovanîyeke germ himbêz dike, ew dixe xizmeta şoreşa rizgariya netewî û sosyalîzmê. Ev tekoşîn û şerê bêhempa yê bi deh salan, Komara Tirkiyê ya faşîst ji aliyê leşkerî, sîyasî, aborî û çandî ve xistiye nav qeyranekê kûr û mezin. Wisa lê hatiye ku dewleta Tirk îro bêçare maye.

Di vê dema nû ya ku em çirûskên serkeftinê dibînin de, hêvî û baweriya gel bi me zêde buye. Divê em xwe li gor jiyan, bîr û baweriya Serokatiyê û têkoşîna wî amade bikin û bersiva demê bidin. Bi hemû hêz û zanebûna xwe, berpirsîyariyên xwe bi cih bînin. Em gelek caran rexne li xwe digirin û dibêjin ku: "Kesayeta burjûwaziyê biçûk, gundîtî, bîr û hestên feodalî û kesayeta dijmin û bandora şerê taybet li ser me çêbuye yan jî heye." Êdî baş dîyare ku em bi rexnegirtinên wiha bi pêşnakevin. Li gor min, rexnegirtina herî rast û di cih de, pratîka me ye. Dijmin bi awayekê giştî bi ser me de tê û êrîşî me dike. Pêwîste ku em jî, bi hemû hêza xwe bi ser dijmin de herin û bi dijmin bidin hîskirin ku em bi biryardarî û bi bîr û bawerî berdêla azadiyê didin û xwe di vê riyê de feda dikin. Dema mirov li dîroka têkoşînê dinêre, PKK bi qehremanî, berxwedan, ked û xebat, bîr û bawerî, buyerên wiha mezin û girîng derxistiye holê ku ew tiştên dûrî eqil û hişmendiyê û ew berxwedan bingehê karektera PKK ye.

Pêwîste ku em xwedî li vê mîrasa pîroz a dîrokî derkevin, biparêzin û pêdiviyên vê dema he bi cih bînin. Niha dem, dema çalakiyên giyanbaziyê ye. Ev pêwîste. Ev pêşveçûneke taktîkî ye. Ev cûreyê çalakiyê, gêwilê dijmin xira dike, têk dibe û gêwilê me jî gelek xurt û bilind dike…

Ji bo jîyanê îdîaya min gelek mezine. Ez dixwazim bibim xwediyê jîyaneke bi rûmet û çalakiyeke mezin. Ji ber ku ez ji jiyanê û mirovan pir hez dikim, vê çalakiyê pêk tînim.

***Zeynep KINACI (Şehîd ZÎLAN)***

### 2- Nameyên Wêjeyî û Vekirî

**a- Nameyên Wêjeyî**

Kesên navdar, bi awayekê herêma hunerî yan wêjeyê, bi armanca rexnekirin yan pêşkêşkirina hest û hizrên xwe, nameyên tê nivîsîn ji wan re **nameyên wêjeyî** tên gotin.

Di pêvajoya nivîsîna nameyên wêjeyî de, taybetmendiyên ramyarî, hunerî, aborî û folklorî ratêxe ber çavan. Di vê wateyê de nameyên wêjeyî, di nava heyînên çanda civakê ya herî girîng de cih digire. Nameyên vekirî yên ku ji bo di çapemeniyê de bê belavkirin, hatîn nivîsîn beşek ji nameyên wêjeyî tên hêjmartin. Di wêjeya me de ji cûrên nameyan re nirx hatiye dayîn. Bz ji SS XV'an heya roja me ya îro tên bikaranîn.

**b- Nameyên Vekirî**

Nameyên ku ji bo rayedaran tên nivîsîn yan bangî gel dikin û piranî palvedidin hizrekê, vekirina nêrînekê yan jî parastina tezekê, ji aliyê kes yan jî saziyekê ve bi riya rojname û kovaran tên weşandinin. Di nameyên vekirî de, mijarên ku ne kesekê tenê têkildar dikin, girseyekê girîng digire dest û pêşkêş dikin. Cûrê nameyên vekirî, dibe ku ahengî cûrenivîsandinekê gotarî, ramanî û taqikirinê be. Mînakên nameyên vekirî, carcar di rojname û kovarên hunerî de rastî me tên.

### 3- Namyên Fermî û Kar

**a- Nameyên Fermî**

Nameyên ji bo ragihandina kar, di navbera endamên saziyan de yan jî bi heman armancê ji kesê taybet re tê şandin re **nameyên fermî** tê gotin.

Di nameyên fermî de ziman, têgihandin, awên bi distûran ve hatine girêdan. Bi taybet nivîsînên di navbera saziyan de tên bikaranîn " destûrên nivîsîna fermî" di bin sergotarekê de, girêdayî rêvebernameyekê tên meşandin.

**b- Nameyên Kar**

Nameyên bi armanca têkiliyên karê bazirganiyê yan jî ji bo sazûmankirina mercên xebatê di navbera aliyan de, saziyên taybet ji hev re yan jî ji saziyên fermî tên şandin re **nameya kar** tê gotin.

**Nameyên kar dibin şeş beş:**
1- Nameyên Qewêtî
2- Nameyên Firotinê
3- Nameyên Gazindan
4- Nameyên Kirînê
5- Nameyên Pendan (şîret)
6- Nameyên Serlêdanê



**KARGEHA AR YA KURDISTAN**

05/03/2015

**Delil MUSLIM HISO**
**Kolana 22/8**
**Kurnîş/QAMIŞLO**

We di dîroka 02/02/2015’ê de, ji me 320 torbe ar xwestibû. Li ser daxwaza we, me di dîroka 05/02/2015’ê berhemê ku we xwestî li gel pelgeyên pêwîst şandiye. Ger hûn bikarin nirxê wê yê ku 1.600.000 dirave, li ser hesabê me yê banqê razênin wê baş be.

Ji ber têkiliyên we yên baş, em spasiya xwe pêşkêşî we dikîn.

Silav û Rêz...

**Aheng DARA**
**Rêveberê Kargehê**



### Taybetmendiyên nameyê li gorî awa û naveroka xwe:

#### a- Kaxez

Divê kaxeza nameyê sade û temam be. Ji derveyî qertên tên çapkirin, divê ev pîvan neyê xirakirin. Di nivîsînên fermî de, dirêjiya nivîsînê çiqas dibe bila bibe, kaxeza tam ya (A4) tê bikaranîn. Her çiqas di nameyên taybet de kaxeza bi reng bê bikaranîn jî, lê ya herî zêde tê bikaranîn kaxeza spî ye.

#### b- Pênûs

Name, bi diwêda reş yan jî şîn tê nivîsîn. Ev tê wateya rêz dayîna kesê li beramberî xwe. Tê wateya; “Min dem ji we re cûda kir, hêjatî nîşan kir, nirx didim we. ”

#### c- Naverok û sazûmanî

**1- Cih û Dîrok:** Li goşeya jor, aliyê rast yê nameyê, cih û dîrok tê nivîsîn.
**2- Beşa Bang (xîtab):** Bangkirin, di wateya denglêkirina bi riya nivîsînê ji bo kesê li beramberê xwe ye. Jixwe name, axaftina nivîskî tê hesibandin. Axaftin, dibe peyvek yan jî bire peyv be.

**Mînakên beşê bang:**
Kurê min
Dayîka hêja
Mamosteyê birûmet
Dostê delal
Rêhevalê birûmet
Serokê min

Li gor nêzîkatiya kesê name jê re tê nivîsîn, tê guhartin. Axaftina baş, diyarkirina hestên xweşik, li gorî nirxdayîna yê li beramberî xwe destpêkekê girînge. Piştî axaftinê bêhnok tê danîn.

**3- Destpêk:** Di serê nameyê de, pleya nêzîkbûna yê li beramber, li gorî naveroka mijarê, zimanê têgihandinê tê cûdakirin. Weke em bêjin, destpêka nameya em ji hevalê xwe re dinivîsin, şêwazekê germ nîşa dike. Nameya ku em ji rêveberiya saziyekê re dinivîsin, divê bi awayekê vekirî armanc bê diyarkirin û hestên baweriyê bide şiyarkirin, bigirin dest. Divê destpêka nameyê kurt û xwerû be.

**4- Vekirin:** Beşa nameyê ya vekirinê, nivîsîna bingehîne. Di vê beşê de armanca nivîsîna nameyê, nûçe, daxwaz, hest, raman û dîtinên hevbeş yên girêdayî niyazan; rexne û têkîliyên

kar cih digirin. Kurtî û dirêjahiya vê beşa nameyê, girêdayî pîvana niyaza mirove. Dibe ku nameyên wêjeyî dirêj bin, lê misoger divê yên kar kurtbin. Tenê rewş û xwestek tê diyarkirin.

**5- Dawî:** Di beşa dawî ya nameyê de, daxwazên başiyê tîne ziman. Di vê beşê de, divê rêz û heskirin cih bigrin. Beşa dawî divê kurt bê girtin.

**Name dikare bi yek ji van gotinên jêr bidawî bibe:**

Silav û rêz
Destê we maç dikim
Xêr bimînin
Bi heskirin çavê we maç dikim
Serkeftinê dixwazim


**6-** Piştî beşa dawî, li milê rastê yê jêr nav, paşnav û wajo tê danîn. Li milê cepê yê jêr navnîşan tê nivîsîn.

**7- Têgir (zerf):** Têgirên nameyan di gelek cûr û pîvanan de tên çêkirin. Ya herî tê bikaranîn, ya ku di şeklê çargoşeyê de ye. Ji nîva kaxeza spî ya (A4) biçûktire.

**Ruwê piştê yê têgirê:**

**a-** Li goşeya çep ya jor nav û nîşana hinêr tê nivîsîn.
**b-** Di nîvê de, nav û cihê navnîşana girtek cih digire.
**c-** Li jêra goşeya rast ya  têgirê, cihê biçe, navê navçe û bajêr tê nivîsîn .
**ç-** Nameyên derdikevin ji derveyî welat, navê welatê diçiyê jî tê nivîsandin.
**d-** Li jora goşeya rastê, pûl tê lêdan.

## Mînakên kaxez û têgira nameyê:




### LÊKOLÎN

1- Ji nasekê xwe yê dûr re, girêdayî jiyana xwe ya dibistanê yan jî girêdayî jiyana rojane nameyek taybet binivîsin.

2- Girîngiya nameyên wêjeyî di jiyana civakê de çiye û çawa têne nivîsandin? Lêkolîn bikin.

3- Ciyewaziya di navbera nameya kar û ya taybet de çiye?

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Li gorî we kengê pêwîst dike mirov daxwazname binivîse?
2- Awayê nivîsîna daxwaznameyê di aliyê kurtbûn û dirêjbûnê de çawaye?


## DAXWAZNAME

Ji bo daxwaza kesan, gazindên wan yan jî rewşekê, ji cihê (meqam) fermî re ragihîne, ji van nameyên fermî re **daxwazname** tê gotin.
Divê daxwazname, li ser kaxaza spî ya bê xîzik, pîvana wê tam û bi diwêda reş yan jî şîn bêyî ku reşkirin bikeviyê, bê nivîsîn.

### Plana Daxwaznameyê

1- Navê cihê (meqama) daxwazname jê re tê şandin, bêyî ku bê kurtkirin tê nivîsîn û bi peyva “JI BO” destpê dike.
2- Di Nivîsînên daxwaznameyê de, rewş, pirsgirêk, daxwaz... tê nivîsîn.
3- Navnîşan ger pêwîstkir, li aliyê çep yê jêra kaxezê tê danîn.
4- Zanîn û pêwîstî (ev beş girêdayî daxwazê beşê dawî ye).
5- Piştî nivîsandina mijara daxwaznameyê, têbiniyên pêwîst li jêra wê tê danîn. (peyva têbinî nayê bikaranîn.)
6- Li milê rastê yê jêr wajo, dîrok, nav û paşnav tê nivîsîn.

## Mînaka daxwaznamê



**JI BO AKADEMIYA ŞEHÎD FERHAD KURTAY**
**BEŞA RAGIHANDIN**
***MEXMÛR***

Min berî dû salan dibistana Amadeyî ya Şehîd KOÇERÎN qedandiye. Daxwaza min ew ku ez li Akademiya we, ji bo perwerdeya sala 2015/2016, di beşa ragihadin de tomara xwe çêbikim.

Tika dikim ku daxwaza min bê pejirandin.

Li gel rêzdariyên min...

**30/07/2015**
**Zozan CÛDÎ**

***Waje***

### LÊKOLÎN

1- Li gorî we dema tiştek hat xwestin, dikare li ser daxwaznamê bê zêdekirin? Ger ne, çima?

2- Ciyewaziya di navbera nameya kar û daxwaznameyê de çiye? Lêkolîn bikin.

3- Hûn jî daxwaznameyekê binivîsin.

# TELGIRAF




Di roja me ya îro de pergalên ragihanidinê yên lezgînî weke; telefon û faksê pirin. Nûçeya tê xwestin zû bigihê kes yan saziyekê, ji bo nûçe, rewş yan jî daxwaza tê xwestin, bi awayekê kurt û cewherî bigihê kes yan jî saziyan, ji telgrafê sûd digirîn.

Telgraf li gor demê gihandinê dibin sê beş: **Asayî, lezgînî, birûskî.**

### Di dema nivîsîna telgirafê de, ev destûr tên pêkanîn:

**Di dema nivîsîna telgirafê de, ev destûr tên pêkanîn:**

1- Li beşa nîvê ya jora kaxeza telgirafê, yek ji peyvên “Asayî, lezgînî yan birûskî” ya tê xwestin tê nivîsîn.


2- Li goşeya çepê ya jora kaxeza telgirafê, nav, paşnav, navnîşana kesê digirê tê nivîsîn.

3- Mijara telgirafê kurt tê nivîsîn.

4- Li goşeya jêr a rastê nav û paşnavê kesê rêdike tê nivîsîn .

5- Li binê vê beşê nivîsînê, xîzik tê kişandin. Di bin xîzikê re li milê rastê, nav û paşnavê hinêr tê nivîsandin. Ev agahî, demê telgiraf negihê cihê xwe, ji bo li hinêr bizivirê tê dayîn. Dema bixwaze navnîşana wî girtek bizanibe, wê demê xîzik nayê kêşan, di nava nivîsîna telgirafê de tê nivîsîn.

## Mînaka telgirafê



**TELGIRAFA LEZGÎN**

**Girtek:**
Pelşîn Ciwan
Taxa Behdîn
Kolana 20 / hêjmar 25
Eşrefiyê Heleb

Min kaxeza şêniya xwe windakiriye, ger bikaribin tomara şêniya min derxin û rêkbikin, wê baş be.

**Hinêr:**
Dara Ciwan
Xwendevanê Zankoya Hewlêr / Enkawa

## VEXWENDNAME

Nivîsînên kurt, yên ku bi armanca bangkirina kesan, ji bo tevlî çalakiyên weke; pîrozbahî, konferens, panel, rûniştinên vekirî, sempozyom, axaftinên amadekirî, dîlan, pêşbirk, şahî, pêşengeh, kombûnên vekirin û girtinê yên tên çêkirin bibe, jê re **vexwendname** tê gotin.

Di vexwendnameyan de, pêwîste ziman sade û têgihîştî be, pêwîste şêwaz li gorî kes yan jî cihê hatî vexwendin be.

### Mînak;

Vexwendnameyên govendan, dibe ku ji hundir bi awayekî bihest bê nivîsîn. Lê vexwendnameyên civînekî zaninstî, bi zimanekî li gel girîngiya mijarê tê nivîsîn. Di vexwendnameyan de pêwîste dîrok, demjimêr, cih û armanca vexwendinê bê diyarkirin.

### Mînaka Vexwendinameyê:

*Bi armanca li darxistina pîrozbahiya rojbûna Rêber Apo ya 4’ê Nîsanê, mîhrîcanek tê li lidarxistin. Telîbûna we ji bo me cihê şanazî û bexteweriyê ye.*

**Dîrok : 4’ê Nîsanê**
**Demjimêr : 08:30**
**Cih : Navenda Çand û Hunerê / Mexmûr - Hewlêr**

***Komîteya Amadekar***

### LÊKOLÎN

Hûn jî daxwaznameyekê di derbarê pîrozbahiya ku xwendevanên dibistan qedandî amadekirîn de, binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Hûn dizanin rapor bi kîjan armancê û ji bo çi tê nivîsandin?
2- Li gorî we rapor dibin berhemên wêjeyî?

# RAPOR

Cûrenivîsên ji bo diyarkirina encama lêkolîn yan jî rewşekê ku li ser mijarekê yan pirsgirêkekê tên nivîsandin, jê re **rapor** têgotin. Qada karanîna raporê firehe. Li ser gelek mijarên cûr be cûr dikare bê nivîsandin. Dikare li ser xebatên dariştinî yên nivîskî yên weke; buyer, ceribandin, filîm, pirtûk û mijarên belkêş bên nivîsandin. Ji beriya ku rapor bê nivîsandin, pirsgirêk bi awayekê kûr tê lêkolîn kirin, sûd ji hemû çavkaniyên girêdayî mijarê tê girtin û bi awayekê bi plan û bimantiq tê nivîsîn. Dîsa, ji beriya ku rapor bê nivîsandin, divê mijarê baş têbigihîn; ji ber ku ger kesê raporê dinivîsîne kûrahiya mijarê baş tênegihe, dibe ku encamek bê mantiq derbikeve holê. Dema rapor tê amadekirin, divê ji hemû çavkaniya sûd bê girtin û hemû sûdên ji çavkaniyan girtîn di raporê de bên diyarkirin. Dema rapor tê amadekirin, ger sûd ji pirtûkekê girtibe, navê pirtûkê, nivîskarê wê, dîroka weşan û cihê weşanê û mijar di kîjan rupelê de derabaz buye, dide diyarkirin. Bi heman şêweyî, ger sûd ji ansîklopedî yan kovaran jî hatibin girtin, divê cihên pêwîst yên van çavkaniyan diyar bikîn.

Rapor, bi şêwazek diyar ji bo berdayîna hizir yan reftarên kes yên li ser raman, buyer yan meseleyekê tê sazûmankirin. Ji ber ku xwendin hêmana herî girîng ya raporê ye, pêwîste kurt, balkêş û têgihiştî be. Pêwîste rapora ku tê amadekirin, bangî asta hestên kes yên çandî, zanyariyên teknîkî û tecrubeyê bike.

## Mijarên raporê wiha tên rêzkirin:

**1-** Nirxandina xebatên giştî û taybet yên di derbarê perwerde û hîndekariyê de.
**2-** Nirxandina çêbûnekê giştî ya tevger yan jî diyardeya buyerekê siyasî.
**3-** Lêkolînên li ser guhetina pirsgirêkên di qadên cuda yên weke; perwerdeya civakî, çand û tenduristiyê de anîna rewşa raporekê.
**4-** Nirxandinên erênî û nerênî yên di derbarê qada aborî de anîna rewşa raporekê.
**5-** Dema xebatên zanistî tên nirxandin, diyarkirina pêşkeftinên erînî û nerênî û anîna rewşa raporekê.
**6-** Dema bermayên hunerî (pêşbirkên wêjeyî, wêne, muzîk...) tên nirxandin, aliyê wan yên serkeftî û nerserkeftî bi awayê rapor tên diyarkirin.



## Ji bo raporekê baş bê amadekirin:

- **Pelgeyên nivîskî:** Çavkaniyên weke; pirtûk, ansîklopedî û kovar.
- **Çavdêrî:** Hûrkolîna cih û rewşên girêdayî mijarê.
- **Pelgeyên devokî:** Hevpeyvîna kesên girêdayî mijarê, sûdê ji çavkaniyên weke; hevbîniyê girtin.





## Mînaka Raporê:

### RAPORA NIRXANDINA XEBATÊN SALEKÊ YA DIBISTANA AMADEYÎ YA ŞEHÎD KOÇERÎN

Sala perwerdeya 2014/2015 di pêvajoyek ku qeyrana siyasî, coxrafî û darayî di herêma em tê de jiyan dikin de hat destpêkirin. Li ruxmê vê yekê jî me karî di demê xwe de, bi coş, xurûş û gêwilek bilid destbi xebatên perwerdê bikin. Lê belê vê rewşê jî nekarî di herikandina xebatên salê de me ji kêm û kurtiyan rizgar bike.

Di perwerdeya vê salê de, kêmasiyên ku li pêşiya perwerdeya me bibin asteng derneketibin jî, lê hinek pirsgirêkên buyîn sedema disîplînî jî çêbûne. Di heman demê de, carcar ne amadebûna henek mamosteyan hatiye dîtin. Ji ber rewşa herêmê, xwendekar ji bo waneyan bi awayek rewanî amade nedibûn. Vê rewşê gelek caran rê li ber belavbûna waneyê vedikir.

Ji bo em bikarin xwe û xwendekarên xwe ji aloziyên derûnî rizgarbikin, divê girîngiyê bidîn xwendina pirtûkên Rêber Apo. Her wiha divê xwendekarên xwe fêrî xwendina heman pirtûkan bikin. Xwendina van pirtûkan wê rê li ber vekirina hest û ramanên me veke. Pirtûkên Rêber Apo yên di pirtûkxaneya me de tine, divê ji bo peydakirina wan hewildan bên dayîn.

Ji bo em îsal jî bi gêwilek bilind dest bi perwerdeya xwe bikin, tê xwestin beriya dibistan destpê bike, li ser girîngiya perwerdê û rewşa herêmê semîner bên dayîn.

**LÊKOLÎN**

1- Girêdayî yek ji mijarên raporê, hûn jî raporekê binivîsin.
2- Sûdên raporê ji bo ragihandina buyeran çiye? Lêkolîn bikin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Gelo we carna şano temaşekiriye?
2- We carna di pêşkêşkirina şanoyan de cihê xwe girtiye?

# ŞANO



Pêşandana ji bo guhdarkirinê hatî amade kirin, li ser dikekê leyîstina leyistokvana ya ji bo temaşekirina tamaşevanaye. Bi awayek din, têgihandina hest û buyer ya bi axaftina û tevger (jest) a ne. Bi awayek giştî, li şûna bermahiya wêjeyî ya ew bi xwe nunerê wê ye jî tê bikaranîn.

Şano, hunerek ya dikê ye. Berhemê şanoyê, buyeran bi riya çêbûnê nîşa dike. Bi vê aliyê xwe, mirov dikare weke pêşandana bi axaftin û çalak jî binav bike. Li milekê din şano weke hunera mirov bi mirovan, bi awayekê mirovane têdigihîne re jî têgotin.

Cudahiya şano ya herî diyar ji berhemên din; berhemên din ji bo xwedin û guhdarkirinê tên nivîsîn, şano; leyîstoka li ser dikê ya li pêşberî temaşevana ye. Pîvana nirxên xwe ji bawerî û têgîna temaşevanan digire. Ji ber xwediyê qerekterek yê tê dîtine, bi kêrhatinên xwe yên zindî derketina holê, deng li derûniya civakê dike. Şano di aliyê endam û berhem de, endamek yê wêjeyê ye. Li gel vê endama wêjeyî, endamên weke; leyîstin, rêk û pêkiya dikê, ronahîkirina wê, dekor, kostum û muzîk di nava çarçoveya şanoyê de cih digirin. Ji nivîsîna şanoyê re leyîstok, ji yê dinivîse re nivîskarê leyîstokê (muelif) û ji kesê li ser dikê leyîstokê pêşkêş dikin re leyîstokvan (şanoger) tê gotin. Her wiha di pêşkêşkirina bermaya şanoyê de, endamên alîkar yên weke; rêveberê dikê yê dekor û kostumê, yê ronahî dayînê, sulforê jî hene.

## Beşên Şanoyê



**1- Trajedî:** Peyva trajedî, peyvek Yunaniye. Weke peyv, tê wateya “stirana bizinan”. Aliyên jiyanê yên bi xem û şîn datîne holê.



**2- Drama:** Hunerek ya zindîkirina hestyariyê ye.



**3- Pêkenok:** Aliyên buyerên jiyanê yên bin ken û henek zindî dike.



**4- Opera:** Awayek yê hunera dikê ye ku bi awayekê giştî mijarên wê, buyerên weke; dîrok, mîtolojî û efsaneye, tevayî yan beşekê wê bi muzîkê hatiye xwedîkirin û tevayî hunerên dîtbar di nava xwe de dihewîne.



**5- Pantomîm:** Cûreşanoyek ya bê gotiniyê ye. Çiqek yê hunerê xwepêşandanê ye.



**6- Tûlûat:** Şanoya tûlûatê, hunerek ya dikê ye ku herçiqasî tê zanîn buyerek ya hûnandiye jî, lê xwe palvenade mijarekê û leyîstokeke xwezayî tê leyîstin.



**7- Operet:** Opereta ku weke operaya sivik jî dikare bê jimartin, berovajiyê operayê, awaza stirana her peyvê nabêje (weke hevpervînekê devokî), di heman demê de leyîstokek bi muzîk ya dikê ya dibe ku di nava wê de dans jî hebe.



**8- Muzîkî:** Şanoya bi muzîk, pêşandanekê hestyar û bişahî ya dikê ya ku cûre leyîstok yan filîmên buyerekê xweserê xwe, bi awayekê hûnandî, hevpeyvîn, dans û muzîkê bi buyerê re dike yeke.



**9- Bale:** Bale, cûrepêşandanek bi dans û muzîkê ya ku xwe palve dide gavavêtinên figurên diyar.



**10- Revu:** Pêşandana dikê ya sivik û bişahî ya ku cih dide henekên rojane, skêç û monologane.

### Hinek Wajeyên Di Şanoyê de Tên Bikaranîn:

**1- Adaptasyon:** Yekbûna bi tevayan re.
**Mînak:** Dema zindiyek cihê xwe di xwezayê de çêdike, çêlikên wê çêdibin û piştî demekê bi wê xwezayê re dibe yek û heta carna rengê xwe li gor wê xwezayê digire.
**2- Aktor:** Di şano û sînemayan de ji leyîstokvanê xort re tê gotin.
**3- Aktrîs:** Di şano û sînemayan de ji leyîstokvana jin re tê gotin.
**4- Diyalog:** Hevpeyvîna di navbera leyîstokvanan de tê kirine.
**5- Dûblor:** Dema filîm tên çêkirin, bi taybet di perdeyên bi tirsnak de dema li cihê leyîstokvanekê leyîstokvanek alîkar rol digre ye.
**6- Fars:** Cûre pêkenokeke ku ji şekil zêdetir li ser buyerê radiweste.
**7- Feerî:** Cûre şanoyeke ku heyînên li ser xwezayê re hatîn avakirin, dramakirina çêrokên di perdeyên şanoyan de derketî holê ye.
**8- Figuran:** Kesê di pêşandana filîm, bernameyên televizyon, leyîstokên şanoyan, muzîkî, opera û baleyan de kêm yan jî qet naxivin.
**9- Jest-mîmîk:** Tevgerên laş û rû.
**10- Replîk:** Di leyîstokên dikan de ji her peyvên ku leyîstokvan ji hev dû re dibêjinin.
**11- Rejîsor:** Di şanoyan de derhênerê belavkirin û sazûmankirina rol, şîrove, dekor û muzîkê ye.
**12- Monolog:**
- Di leyîstokan de dema kesek xwe bi xwe re taxive ye.
- Dema kesek buyerek piranî biken dide têgihandin.
- Dema kesek buyerek biken ya berê hatî tomarkirin, ji temaşevanan re zindî dike ye.
- Leyîstokek ya yek kesiye.

**13- Kulîs:** Cihê li pişt dikê yê ku leyîstokvanên xwe amadekirî lê radiwestin.
**14- Kostum:** Navê tevayî cil û bergên leyîstokvanên filîm û şanoyane.
**15- Perde:** Ji her beşek yê filîm yan şano yan re perde tê gotin.
**16- Suflor:** Kesê li pişt dikê ji bo leyîstokvan axaftinên xwe ji bîr nekin bi dengekê nizim ji wan re dibin alîkare.
**17- Mîzansen:** Li ser dikê bicihkirina berhemekê şanoyê, li gorî dikê sazûmankirin û şîrovekirina wê ye.
**18- Melodram:** Cûrek yê sînemayê ye ku girî û drama xirakiriye û ji şêweyê karîkature kirininê derketiye holê ye.
**19- Myster:** Tişteke nayê zanîn û têgihiştine ku bi merez û nepenî.
**20- Skêç:** Leyîstokek kurt, piranî bi yariyan bidawî dibe, kêm kes û xwerû û xwedî naverokekê pêkenoke.
**21- Dublaj:** Piştî kişandina filîmekê, bidengkirina wê li gor tevgerên laş û rû yan jî li ser wê barkirina zimanekê dine. Bi wateyekê din, bidengkirine.
**22- Dîksyon:** Di axaftinê de hilbijartina peyvan û li gorî awaz û hêmadanînê gotin, her wiha bi awayekê hêsanî têgihandine.



**Beşên Dîksyonê:**

**a- Perwerdeya deng:** Giraniya deng, rawestek, lêdan, bêhn danûstandin û deng.

**b- Perwerdeya peyvê:** Hilbijaritin peyvê, gotina peyvê. Bi balkişandina li ser lêdanê, dirêjkirina peyvan ya bi hev re yan jî sazûmankirina raweste-kê.

**c- Herikandina gotinê:** Balkişandina li ser hêma-danîn û zindîbûna gotinan.

**d- Têgihandin:** Di têgihandinê de xwezayîbûn, uslûb, vekirîbûn, hêza deng, wêneyîkirin, ziravîtî, tevger û teqlîd. Li gorî wê, sazûmankirina tevgerên laş û rû.



**Mînaka Şanoyê:**

## DESTHILATDARÎ

(Pênc kesên ku nunertiya civaka mirovahiyê dikin, weku cîhanê ber bi ronahiyê ve bibin, şeklê cihanê bi awayek mezin li ser dikêye û evên he wê cîhanê pêşde bibin. Dema pêşde dibin, çar kesên ku nunertiya dewletên dagirker dikin, tên pêşiya wan û wisa berdewam dibe.)

**Desthilatdar:** "Rawestin, li vir bidawî dibe, her gelek bi tena serê xwe nikare jiyan bike. Her kes di bin destê desthilatdariya me de neçare jiyan bike, hemû derfetên jiyanî wê ji bo we bê dayîn. Ger hûn vê nepejirînin, hûnê hemû tine bibin.

**Azad:** "Binêre, ti hêz nikare bibe desthilatdarê jiyana mirov. Her gelek, her netewek bi hebûna xwe ya xwezayî dikare jiyan bike.

**Jiyan:** "Heya niha me çawa jiyan kiriye, ji vir û şûn de jî, emê bi hebûna xwe ya xwezayî jiyan bikin.

**Desthilatdar:** Ji xwe mafê te yê axaftinê tine ye.

**Arîn:** Ji xwe ji beriya her tiştî we jin tine kirine, we weke amêrekê girtiye dest. Lê jin wê serî rake û wê xwe radestî koletî û tarîtiya we neke û wê ti carî nebe hevkarê zordarî û kolekirina we.

**Desthilatdar:** Çêrokên vale nebêjin, hûn nikarin ji vir şûn de pêş de biçin.

**Kawa:** Hûnê çi bikin? Binêrin, her kes çûn, em tenê mane. Ma heya kengê emê rawestin?

**Bêrîtan:** Bila hêviyên we neyên şkandin, wê ronahî were, wê roj ji Rojhilat derkeve; Bakûr, Başûr û Rojava ronî bike.

**Arîn:** Cilên reş yên li ser me hatine pêçan, wê nikare me ji hebûna me dûr bike. Wê rojek were û ev cilên reş bên rakirin û emê bi rastiya hebûna xwe ya xwezayî re jiyan bikin.

**Jiyan:** Li ser vê xakê rastiyek ya hebûna me heye, vê rastiyê jî ti kes nikare winda bike

**Azad:** Emê ti carî dest ji hebûna xwe bernedin. Kesên ku li benda me sekinîne hene. Em ber bi ronahiyê ve diçin.

**Kawa:** Emê kengê bigihin wan?

**Azad:** Çiqas em bi hêvî û bawerî bimeşin, emê ewqas nezikî wan bibin. Pir nêze em bigihin wan. Dema em gihistin wan, wê gavê tû wê bibînî. Welatê ku di dergûşa xwe de azadî afirandî, em bihêvîne wê bê dîtin.

**Azad:** Binêrin, dewletên hatine avakirin, li ser hev kom dibin. Wê disa li ser keda mirovahiyê ruwê xwe yê reş bidin diyarkirin.

**Jiyan:** Wê şerê cîhanê dest pê bike. Komkujiya bi hezarê salan berdewam kiri, wê hîn bêhtir û bihovanetir berdewam bike.

**Arîn:** Wê dijminên me diyarbibin kîne, wê ruwê wan yê reşê di bin maskeyan de hêj zelaltir derbikeve.

**Azad:** Wê ax û tixûban li gorî berjewendiyên xwe bi kar bînin. Wê tixûban li gorî xwe xiz bikin û wê Kurdan bikin qurbana vî şerî. Wê her cihî talan bikin û ji bo me jî tine bikin, wê welatê me Kurdistan parçe parçe bikin. Lê ji bîr nekin ku em hêj ber bi azadiyê ve diçin.

**(Dewletên dagirkerên hevpeyman li dora cihanê komdibin û daxivin.)**

**D 1:** Weke hûn dizanin, ev şerê me dayî meşandin, plana wê ya sereke li ser Rojhilata Navin bû. Gelek xalên me dayî pêşiya xwe, divê bilezgîn têkevin meryetê.

**D 2:** Ezbenî, me weke dewletên Firansa, Ingiltere û Amarîka, di qonferensa aştiyê ya Parîsê de daye destnîşan kirin, dewletên li hemberî me binketin, me peyman bi wan re da çêkirin. Bi Almanya, Bûlgaristan, Awusturya û Macaristan re peyman hatine tomarkirin. Dewleta Osmanî maye. Weke peymana Sewrê, divê ew jî ji nû ve têkevin tevgerê.

**D 3:** Di hevpeymaniya me de, dîroka 1920'an hatiye pilan kirin. Ji xwe divê were çêkirin. Ji beriya niha çar salan, di sala 1916'an de me di peymana Sykes-Picos de hinek tixûb dabûn çêkirin. Li gorê vê peymanê; Tirabzon, Erzurum, Wan, Bidlîs û beşek ji başûrê rojhilatê Antolya wê bigihe Rûsya. Ji bo Firansa yê jî, rojhilatê Derya Sipî, Dîlok, Edene, Ruha, Amed, Musil û peravên Suryê bû. Her wiha bendavên Heyfa û Akka, Bexda û Mezapotamya ji bo Ingilistanê bû. Di van xetande li gorî berjewendiyên me divê pirsgireka Kurd hertim di rojevê de be. Divê hertim pirsgirekên Rojhilata Navîn di mijarên pirsgirekan de bin.

**D 4:** Belê, xetên me dayîn çêkirin, diyarbikîn. Rojhilatê Tirakya, rojavayê Anatolyayê ji bo Yûnanistan. Mêrdîn, Ruha, Dîlok û Surye ji bo Firansa ye. Derya Ege ji Yûnanistanê re, gireva Rodos û Dazdegirav jî ji Italyayê re.

**D 2:** Erebistan î Êraq ji Ingilîstanê re. Wê başûrê rojavayê Anatolyayê bigihe Italya yê. Wê li ser xaka Kurdistanê, Ermenistan û Kurdistan were avakirin, lê dîsa wê dibin qontrola me de bin. Tenê wê Stembol û hinek cihên din ji bo we bimine.

**D 3:** Rêveberiya sê kesî ya ji aliye Ingîltere, Firansa û Italya yê ve hatî avakirin, wê li Stenbolê bi cih bibe. Biryarên bêne girtin, divê hûn bipejirînin.

**D 2:** Ha benda 64 ji bîr nekin. Gava ku gelê Kurd di nava salekê de bixwazin serbixwe jiyan bikin, divê hûn ji xaka wan derbikevin.

**D 4:** Ezbenî, divê mafek wisa neyê dayîn.

**D 3:** Na, ji xwe cihên bikevin destê Kurdan yan jî herêmên wan hemû dibin qontrola Ingilîzan de ye. Ji xwe peyman li gorî xwestekên Ingilîzan hatiye çêkirin.

**D 1:** Erê raste. Tevahiya bakûr, rojava û rojhilatê Kurdistanê ji dervey Kurdistanê dimîne. Parçeya dimîne jî dibin destê Ingilistanê de dimîne. Tevgera li Êraqê girînge, divê em vê ji bîr nekin.

**D 2:** Bi vî awayî her der hatiye parçe parçe kirin. Êdî rabûnek çênabe.

(Dema dewlet gotinên xwe xilas dikin, derdikevin ji derve. Ew çend kesên li cem cîhanê hemû tên pêşberî cîhanê, serê xwe ditewînin, her yek berbi cihekê ve diçe. Her yek li aliyekê cîhanê yê bakûr, başûr, rojhilat û rojava dirûnin. Bi rîniştinê re dewlet tên li ser dikê.

Dema dewlet tên; paçê bi cîhanê de hatî dayîn vedibe û di nava wê cîhanê de çar kes; dû xort dû jin bi cilên hevalan ve tên destê wan. Kesên rûniştî, digrin û dizivirin. Dewlet jî bi vî awayî di cihê xwe de dirûnin û bi vî awayî bidawî dibe.)

*Berxwedan Tunç*

## LÊKOLÎN

1- Kurte dîroka şanoyê lêkolîn bikin û encamên lêkolîna xwe bi awayê biroşur berhev bikin.
2- Em çima ji peyva “tiyatro” re dibêjîn şano? Lêkolîn bikin.
3- Kurte dîroka şanoya Kurdî lêkolîn bikin.






**1- Ji yên jêrî kîjan ne cûrek yê dariştina nivîskî ya pexşane?**
a- Şano
b- Rapor
c- Çêrok
d- Pêkenok
e- Gotûbêj
**2- Ji beriya nivîsîna serpêhatiyê, kîjan xala jêrî nayê berçav girtin?**
a- Pêwîste kes, dem û cihê buyerê, bi buyerê re, di nava ahengiyekî de bin.
b- Divê hest, hizir û endamên xiyalan, wêneyîkirin, danûstandin, neyên ji bîr kirin. Pêwîste di têgihandinê de zindîbûn, di hilbijartina peyvan de taybetbûn, li ber çavan bên girtin.
c- Plana wê, ne tevgere.
d- Pêwîste ramana bingehîn ya serpêhatiyê bê diyarkirin.
e- Divê buyer jiyan bûbe yan dibe jiyan bibe.
**3- Ji bo nivîsîna fikrayê, ji yên li jêr kîjan ne riyek bê şopandine?**
a- Mijarekî balkêş ya ku hûn nivîsandinekî li ser binivîsin hilbijêrin.
b- Mijara xwe bi tuxûb nekin.
c- Ramana bingehîn danin holê.
d- Armanca nivîsîna xwe diyar bikin.
e- Divê we ramana alîkar ya ku destekê dide ramana bingehîn amadekiribe.
**4- Cûrenivîsîna biplana giraniya wê bihizirînê hatî nivîsîn ya herî girîng kîjane?**
a- Serpêhatî
b- Wêneyîkirin
c- Gotar
d- Pendên Pêşiyan
e- Nivîsînên Rexneyî
**5- Ji yên jêrî kîjan ne taybetmendiyek ya Gotarê ye?**
a- Di rojname û kovaran de tên weşandin.
b- Piranî gotar bi awayekên dirêj û dorfireh tên nivîsîn.
c- Dikare li ser her mijarê gotar bê nivîsîn.
d- Tez û ramanên ku tên pêşkêşkirin, tên piştrast kirin.
e- Serî li leyîstokên peyvê nade û ji têgihandinekê xemilandî dûr radiweste.

**6- Nivîskarê di mijarekê de, hest û hizirên xwe berî ku here darezandinekê, bi têgihandinek hundirîn û taybet dinivîse, ji vê cûre nivîsînê re çi tê gotin?**
a- Nivîsînên Ramanî
b- Roman
c- Gotar
d- Taqîkirin
e- Bîranîn
**7- Ji yên jêrî kîjan ne cûrek yê nameyê ye?**
a- Nameyên Vekirî
b- Nameyên Fermî
c- Nameyên Evîndarî
d- Nameyên Wêjeyî
e- Nameyên Kar
**8- Ji yên jêrî kîjan ne xalek ya plana daxwaznameyê ye?**
a- Navnîşan ger pêwîstkir, li aliyê çep yê jêra kaxezê tê danîn.
b- Piştî nivîsandina mijara daxwaznameyê, têbiniyên pêwîst li jêra wê tê danîn.
c- Zanîn û pêwîstî (ev beş girêdayî daxwazê beşê dawiye).
d- Di Nivîsînên daxwaznameyê de, rewş, pirsgirêk, daxwaz... tê nivîsîn.
e- Li milê rastê yê jor wajo, dîrok, nav û paşnav tê nivîsîn.
**9- Ji yên jêrî kîjan cûrêk yê Telgirafê ye?**
a- Telgirafa Gazindan
b- Telgirafa Asayî
c- Telgirafa Pendan
d- Telgirafa Serlêdanê
e- Telgirafa Kar
**10- *"Di ................. de, pêwîste ziman sade û têgihîştî be, pêwîste şêwaz li gorî kes yan jî cihê hatî vexwendin be."***
**Kîjan ji vebijarkên jêrî dikare di valahiya hevoka jor de cih bigire?**
a- Daxwazname
b- Name
c- Telgiraf
d- Vexwendname
e- Têbinî

**11- Ji yên jêrî kîjan ne mijarek ya raporê ye?**
a- Nirxandinên erênî û nerênî yên di derbarê qada erkên xwe de anîna rewşa raporekê.
b- Nirxandina xebatên giştî û taybet yên di derbarê perwerde û hîndekariyê de.
c- Dema xebatên zanistî tên nirxandin, diyarkirin pêşkeftinên erînî û nerênî û anîna rewşa raporekê.
d- Lêkolînên li ser guhetina pirsgirêkên di qadên cuda yên weke; perwerdeya civakî, çand û tenduristiyê anîna rewşa raporekê.
e- Dema bermayên hunerî (pêşbirkên wêjeyî, wêne, muzîk...) tên nirxandin, aliyê wan yên serkeftî û nerserkeftî bi awayê rapor tên diyarkirin.
**12- Ji çi re hunerek ya zindîkirina hestyariyê tê gotin?**
a- Bale
b- Tûlûat
c- Drama
d- Fars
e- Suflor




## CÛRÊN DARIŞTINÊN NIVÎSKÎ YÊN HÛNANDÎ

### XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Gelo we dizanî destan jî berhemek dariştiniye?
2- Li gorî we pêkane ku destan bi şêweyê hûnandî bê nivîsandin? Ger ne, çima?

## DESTAN

Destan cûrenivîsînek ya wêjeya hûnadî ya bi awayê dariştinî hatî sazûmankirine. Buyerên girîng yên ku di jiyana gelan de qewimîne, nehatine nivîsnadin, bi riya destanan ji windabûnê rizgar bûne. Ev buyerên girîng jî, ne buyerên ji rêzêne. Her wiha buyerên awartene. Buyer bi xwe ne awarte jî be, lê di vegotinê de xemlên awarte girtine. Di destanê de ji yekê zêdetir leheng hene. Hin lehengên dîrokî di van destanan de bûne awarte û weke lehengên destanê yên sereke derketine.

Di dîroka gelan de ev buyerên girîng weke çêrok derbazî destanê bûne û awayê xwe yê nû girtine. Bi vî aliyê xwe yê nû, rewşên xwe yên awarte standine û bûne destan. Destan piranî li ser mijarên buyerên şer, lehengî, koçî, karesatên xwezayî û xelayê tên gotin. Ev buyerên he di hişê gel de şopên xwe hêlane û pişt re derbazî nivîsînê bûne. Ev, buyerên rastin. Bi derbazbûna demê re, ber bi ber li gel xemil, nîşan û sembolan, awayê balkêş girtine. Di nava gelan de li ser zar û ziman bi awayê dariştina nivîskî ya hûnandî hatiye pêşxistin.

**Mînaka Destanê:**



# DESTANA DERWÊŞÊ EVDÎ

Li lo li lo li lo
Li yane keko sed û bîst roja dilê min li yane
Konê Wuskan Başî konekê girane
Konekê li ser bîst û çar stûnane
Çar stûnên wî li dewsê kîkane
Çar stûnên wî li dewsê milane
Çar stûnên wî li dewsê qeregê çiyane
Çar stûnên wî li dewsê dûvgeniyane
Çar stûnên wî li dewsê simbil û bendiyane
Çar stûnên wî li dewsê akinciyane
Çar stûnên wî li dewsê Tirkane
Çar stûnên wî li dewsê Lazane
Çar stûnên wî li dewsê xanima kevaniyane
Tû seyr bike vê sivengê malxirabo
Bîst û çar eşîrên giran li konê giran li hev civiyane
Bi şev û ro dixwin goştê emlika birincê ser sêniyane
Buyurbuyrê qaweciyane
Fincana bilind dikin bi dû tiliyane
Bi ser xwe de diqulipînin bi gulmane
Divê xaliqê alemê aniye ser me qewxekê bend girane
Wuskan Başî mîrê di Milane
Tû sery bike bira li meydanê kî berxe kî berane
Gidî gelo birebirê Kurdane
Ji xwe re di cihê xwe de rûniştîne
Malxirabo her yekê pesnek li xwe dane
Tû dêhna xwe bidê Wuskanê Başî
Mele Xelîl derketin hêşiyê konane
Pêgermokê digerin hêlî konane

Nêrîn sê di siwar ji wê de hatin siwarê Ubeyşane
Kefenê wane li terkiya hespa girêdane
Rimê wane bi jarê kildane
Rimê li ortê wan û zînane
Xwe ji jor da berî nav eşîra mila dane
Vê sivengê tû dêhna xwe bidê serê hespan nadine destê ti îbadane
Malxirabo destê xwe kirine binê cêvane
Kaxit derxistin fenanî ruwê lihêfane
Pakî bi navê dostane du pa bi navê dijminane
Tû dêhna xwe bidê go pênc sed mêrê...
Pêncsed mêrê me ji Tirkane
Pêncsed mêrê me ji Gêsiyane
Pêncsed mêrê me ji Şemlane
Serekê pêncsed mêrê Şemlane
Çil Îbrahîm bavê Hemûd kekê Zelîxane
Serekê pêncsed mêrê Tirkane
Gera Ferma Tirkî Şeibane
Serekê pêncsed mêrê Gêsiyane
Mehmûdê Gêsî serokê wane
Bê li çiyayê Dilşanê li Feyzê Qemitê
Li warê Têhtokê li newala Xelîlokê
Li rasta Qetika li delavî Tehtika
Li newala kevirê xweş û miriyane
Îro ji êvarî de xwe berdane kozik û kemînane
Tû sery bike ji te dixwaze herbekê bend girane



*Ji çanda gelêrî*

**LÊKOLÎN**

1- Destana Xanê Lepzêrîn lêkolîn bikin.
2- Çima di roja me ya îro de nivîsînên destanî pêşnakevin? Lêkolîn bikin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Ma mirov dikare bêje helbest û stiran yeke? Ger ne, çima?
2- Dema em bixwazin mijarekê têkildarî civakê binivîsin, emê bi çi awayî binivîsin?
3- We carna guhdarî stiranên kevnarên Kurdî kiriye?

## STIRAN

Di wêjeya Kurdiya kevnar de gelek cûrên stiranan tên dîtin. Di vê derê de emê çend cûran weke mînak bigirin dest.



### STIRAN ÇI YE?

Stiran, cûrenivîsînek ya dana têgihandina hest û xiyalane. Ji rêzikan çêdibe û ev rêzik di bin hev de tên nivîsandin. Ji nivîsîna bi kafiye û pîvan re stiran têgotin. Di kilasîzma Kurdî de wêjevanên Kurd ev cûre nivîsîn bikar anîne.

**Her stiran ne helbeste, ji bo em ciyewaziya di navbera wan de bibînin, divê taybetmendiyên li jêr bişopînin:**
**1-** Di helbestê de em nikarin hestên xwe bi awayê pexşan binivîsin, lê di stranê de em dikarin hestên xwe bi awayê pexşan binivîsin.
**2-** Di helbestê de hûnandin ne li ser buyerekê tê çêkirin, di stiranê de hûnandin li ser buyerekê tê nivîsîn.
**3-** Di helbestê de hest û bangên kesî di plana pêş de ne, di stiranê de buyerên civakî yên jiyan buyî yan dibe jiyan bibe tên bikaranîn.
**4-** Di helbestê de giranidayîna pir watebûn û xiyalê heye, lê di stiranê de peyv weke wateya xwe ya ferhengî tê bikaranîn.





## Taybetmendiyên Stiranan:

**1-** Stiran serpêhatiyên hûnandîne.
**2-** Buyerên civakê têkildar dikin, bikar tîne.
**3-** Bêhtir mijarên bibandor, hînker û fêrker yên ku waneyan didin, hildibijêre.
**4-** Balê dikişîne li ser pîvan û kafiyê.
**5-** Wate, di rêzikên jêrî de berdewan dike.
**6-** Cih dide axaftinên beramber.
**7-** Dibe ku dirêjiya rêzikan newekehev bin.




## Mînakên Stiranan:

**1)**

### BERXWEDANA MALA ELIYÊ YUNIS

Fermane bavo fermane, dayê fermane
Li ser serê mala Eliyê Yunis çi ecêb û çi tofana girane
Îro serê sê şev û sê rojaye eskerê ordiya Tirka
Li ber pira mala Badê li newala qermûşê lev civyane
Hecîkê mala Eliyê Yunis sond xwarine bi sonda yemanê
Bi telaqê jin berdanê emê serê xwe ne êxin şewqane
Destê xwe ne êxin kelmçane
Heta rojek ji emrê me hebe
Emê serê xwe ne êxin ceherê van s... Tirkane
Minê halo dinêrî ordiya Tirka yek dibêje elo yê dî dibê efendim
Şêst û sê welayetê Tirka bi yek carê xeber dane
Hecîkê mala Eliyê Yunisin
Bi elba fîşek berdane ser guhê van ebane
...
Heyfa mina nakevê kuştina mêran
Heyfa mina dikeve wê heyfê
Heyfa bîst û heft (?) ciwanên me Kurdan dane bin lingane
...

*Ji çanda gelêriya Kurdewarî, stiranek xembarî*



2)

## CEMBELÎ

De lorî lorî lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî
Le Faris Begê diçû alîkî Derwêş Begê radibû pê
Faris Begê digo Derwêş Begê dilê min dibê sed carî dilê min dibê
Ezê bidim te sed devê cot pezê sed kibêlê serê tevlê sed miyê dotinê sedê firotinê
Her çar lawê te bizewicînim ji êlê tû yê bidî min Binevşa Narînê stêrka berbanga sibê
Rewşa xezala rewşa berîvana min tenê ax lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî lorî
Lê Derwêş Begê diçû alîkê Eynê, Eynê radibû pê
Derwêş Begê digo lê lê Êynê dilê min dibê sed carî  dilê min dibê
Hatiye mala me mêvanek ji mêvanê ebrê ne mêvanê xêrê
Mêvanê şerê dibê tê sed devê cot pezê sed kibelê serê tevlê sed mîhê dotinê sedê firotinê
Her çar lawê te bizewicînim ji êlê tî yê bidî min Binevşa Narînê stêrka berbanga sibê
Rewşa xezala rewşa berîvana min tenê ax lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî lorî
Lê Eynê diçû alîkî Binevşê radibû pê dikete peşnê min anî başbazirganî
Salê digo lê lê dayê ez kanî me kaniya Diyarbekirê çil û çar kanî derbûne li dorê
Ez biçûkim hîna natime zewacê ezê bême zawacê nastînim zêdebî
Cembelî lawê Hekarya li dunê
Bila serê sibê hetanê êvarê cotê tajiya berde berêzeyê cotê kewa berde
Ji qefesê li ser sîng û berê min rebena Xwidê bike seyd û nêçîrê
Ax lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî lorî


***Ji çanda gelêriya Kurdewarî, stirana evîndariyê***

**LÊKOLÎN**

1- Stiranek yê şeran lêkolîn bikin û binivîsin.
2- Stiranek yê şînê lêkolîn bikin û binivîsin.

**Mînak:**
**Benda Rostemê Zal**

## ROSTEMÊ ZAL



Rostem kurê Zalê ye, Zal kurê Dalê ye, Dal kurê Qalê ye. Demê Rostem radibe ser xwe, gurzê giran bi destê rastê hiltavêje, bi yê çepê digire; bi yê çepê hiltavêje bi yê rastê digire, gurzê wî çirîskên agirî batiman batiman jê difirin. Melayîket ji ezmanan lingên xwe dikişînin, hirç li pişt çiyayê qaf ji tirsan difetisin. Jinikên dûcanî barê xwe tavêjin; dibêjin Rostemê rabuyî ser xwe, ya rebî tû di gel wî bî. Wê cîhanê bifetîne.

Rojekê Rostem diçe deştê û dikeve çilxanê (çil rojan di xew de dima), Mercana Reş dizane Rostem li deştê çil roje ketiye xewê, dêwên balefir radike û diçin Eşqelê belekê Rostem tînin, dibin heftbehranê. Piştî Serhing dizane Eşqelê belek yê Rostem çuye heftbehranê, hêza xwe kom dike û dibe li ser Aryan û Tûrana, dixwazin bi Rostem re şerbikin. Rostem dibêje; "Heya Eşqelê belek neyê, ez naçim şer." Zal gel kom dike û dibêje; "Kî wê here Eşqelê belek bîne." Gel dibêje; " Ne mala Zalê be ti kes nikare."

Zal: "Ji mala me kest nîne."

Gel: "Bila Bewziyê kurê Rostem here."

Zal: "Bewzî biçûke, li nav biçûkan kabanê dileyîze."

Lê neçar dibe yekî rêdike û ew yek ji Bewzî re dibêje; "Bapîrê te, te dixwaze dîwanxanê." Piştî Bewzî vê gotinê dibihîze, tûrikê kabên xwe vale dike erdê û ji hevalên xwe re dibêje; "Madem bapîrê min, min dixwaze dîwanxanê, wê demê ez êdî bi we re kab naleyîzim. Bila kabên min jî ji we re bin.

Dema çû ber qesra bapîrê xwe, xwest di pêpilkan re hewa bikeve, lê dema pêl pêpilka dike, her pêpilka pê lê dike metreyekê di axê de diçe. Li xizmetkaran dizivire û dibêje; "Hey mala we xira bibe, we nekariye hûn van pêpilkan wisa çêbikin ku zarokek weke min li ser wan re biçe gel bapîrê xwe."

Zal dibêje: "Ristan bînin, bêxin bin milên wî û wisa hewa bixin. Ger ne, wê qesrê hilweşîne."

Bi ristan wî dikişînin dîwanxanê. Dibêje xêre we ez xwestîm diwanxanê?

Bapîr: “Dema bavê te ketî çilxanê, kafiran Eşqelê belek yê bavê te birine heftbehranê, here bîne ji bo bavê te derkeve şer û me ji destê van kafiran rizgar bike.

Bewzî: “Bapîr, ez zarokim, ma ez ji kû dizanim heftbehran bi kû ve ye?”

Bapîr: “Bi pirsan mirov diçe dawiya cîhanê.”

Amadekariyên Bewzî dikin û Bewzî dikeve rê. Piştî diçe, Zal dihizire û dibêje; “Çar roj mane Bewzî hukmemêr (baliq) bibe, wê bikeve çilxanê û wê kafir wî bikujin.” Li ser wê xeberekê ji Gurgîn û Bêje re rêdike û ji wan re dibêje; “Pêwîste hûn li pey xalê xwe herin, ji ber ku xalê we nêzîk de wê bikeve çilxanê û kafirê wî bikujin.”

Gurgîn û Bêje: “Bapîr ma em ji kû dizani xalê me bi kû ve çuye?”

Zal: “Hûnê dewsa hespê xalê xwe bibînin û heya dawî hûnê li pey dewsa wî herin.”

Bewzî jî diçe, di riya xwe de rez û baxekê dibîne. Rezekê gelek mezine, hawirdorê wî hatiye sênç kirin, ti kes nikare here nav vî baxî, li ser re firinde jî nikarin bifirin.

Bewzî: “Mala we xira bibe, we ew wisa asê kiriye, zarokek weke min nikare biçe nav de avekê vexwe” û pehînekê li sêncê dide, hildiweşîne û derbazî nav dibe. Piştî vexwarina avê û xwarina tirî, li wir dikeve çilxanê. Dema xwarzayê wî tên û dibînin xalê wan di xewa çilrojan de ye, li kêleka vî baxî xaniyek mezin heye, di vî xanî de xwişka sê dêwan Gulbihar rûniştiye. Dema dibîne dû kes di nava baxî de ne, Gulbihar ji xadimên xwe re dibêje; “Rabin bilez xwarinekê çêbikin, bibin ji van kesan re bila bixwin û biçin da ku birayên min wan nebînin.”

Piştî xizmetkar xwarinên dibin û gotinên Gulbiharê ji wan re dibêjin, ew jî dibêjin; “Dema birayên wê tên çi diqewime?”

Gulbihar bang dike û dibêje: “Dema birayê min yê yekê Yekhezar tê, sermayek li dinyayê çêdibe, dema Dûhezare tê ewrek rewş peyda dibe û dinya dibe mij û moran, dema Sêhezare tê ewrê spî dikevin ezmanan, berf dibare û ji sermaya wê dinya diqerise. Li ber hêlma wan tikes nikarin rawestin.”

Ew jî dibêjin; “Başe, ve me zanî nîşaneyên hatina wan çine, vêca herin.”

Xadim ji Gulbiharê re dabaşa van dikin û dibêjin: “Ti kesên weke van her duwên di nava bax de ciwan me nedîtine. Lê yek di xew de bû, aliyek yê ruwê wî xuya dikir, tiştek pir seyr bû. Xweşikbûna wî ti kes nizane çawane.”

Li ser vê gotinê, çavên Gulbiharê dimine li ser şerê wan û birayên wê. Dema sermayek tê, pêdihesin ku Yekhezar hatiye.

Bêje dibêje: “Ezê herim şerê wî. Bêje diçe şer û Yekhezar dikuje.” Piştî wê li gor nîşanê hatî dayîn Duhezare jî tê. Dîsa Bêje ji birayê xwe re dibêje; “Ezê biçim şerê wî.” Piştî şerek giran Duhezare jî tê kuştin. Wextê Sêhezare tê û dibîne ev mirov di nava baxê wan de ne, dibêje; “Wey la pêşîkên zozanan, wextê teyr û tuwar li ser baxê min re difirin, ez diwazim çeng û perên wan bibirim, didanên min tarihe, ezê we bikim kuna didanê xwe belkî didanên min tena bibin.” Li ser her milek yê wî kitek yê beraşan heye.

Gurgîn: “Te ya xwe got lê te ya Xudê negotiye.”

Gurgîn û Bêje bi hev re diçin şerê wî. Her cara Sêhezar beraşekê li wan werdike, dinya dibe toz û duman, yek yekê nabîne. Dema toz û duman xilas dibe, ji hev re dibêjin; “Bi xwidê evê me bikuje.”

Her dû diçin hindava serê xalê xwe, bostekê ji kevlê stuyê wî dibirin. Bewzî destê xwe li stuyê xwe dide û dibêje; "Heyla mîratê pêşiyek gezek li min da."

Xwarzî: "Xalo ne geza pêşiyê ye, rabe hindik maye ev kafir me bikuje. Heta wê te jî bikuje."

Bewzî: "Dema hûn nikarin şerê xelkê bikin, hunê nehatibana. Çima hûn li pey min tên?"

Bi kişandina hêlma Bewzî re, Sêhezar tê li devê wî dikeve û bi stuyê wî digire ji milan dertêxe. Piştî hingê her sê bi hev re diçin qesrê. Sê rojan ji keyfa Gulbiharê xwe ji bîr ve dike û dimîne qesrê de.

Xwarzî: "Xalo kafiran dora bajarê me girtine, em bilezin, tû mayî bi keyfa xwe ve."

Piştî wê xatir ji Gulbiharê diwaze, Gulbihar ez jî wê bi we re bêm lê ew napejirîne.

Gulbihar: "Dema hûn herin kafir wê bên û min bibin."

Bewzî: "Ezê navê xwe li ser qesrê binivîsim. Kafirên ji Rojhilat ve bên wê bi Rojhilat ve, yên ji Rojava ve bên wê bi Rojava ve birevin." Xatiran dixwazin, dikevin rê û diçin ser behrê. Dema diçin ser behrê li wan dibe şev. Li şkeftekê de bicih dibin. Bewzî diraze, her dû xwarziyên wî dimînin şiyar. Dengê dû jinan tê, bi hev dû re daxivin.

Yek ji yekê re dibeje; "Ev kîne, wê biçin kû?"

Ya dî dibêje; "Evê he Bewziyê kurê Rostemê Zalê ye, ewên din jî xwarzayên wî ne, dixwazin herin heftbehranê. Mercana Reş hespê bavê wî biriye, wê biçe hestpê bavê xwe bîne. Lê çiqas li vir rawestin jî nikarin derbazî heftbehranê bibin."

Ya din dibêje; "Ger xwarziyên wî dengê min dikin, bila sibe rabin biçin ber behrê, berek weke qubekê li wire. Bila bixwazin wî berî rakin, lê nikarin rakin. Dema xalê wan rabe wê ji wan re bêje ma hûn çi dikin, xwe mijûl nekin werin em herin. Bila ew jî bêjin heta tû vî berî ranekî, em nayên. Wê demê xalê wan dê neçar bibe wî berî rabike. Dibin wî berî de hefsarek heye, wê wî hefsarî derbixînin, wê hefsar sê caran li ser behrê re bihejênin. Wê demê kurîbehrek wê ji behrê derkeve, wê lê siwar bibin û derbazî heftbehranê bibin."

Bi wî awayî radiwestin heta dibe sibeh. Gurgîn û Bêje diçin li vî berê mezin digerin û dibînin. Dixwazin vî berî rabikin, lê dikin û nakin nikarin rakin.

Pêre pêre xalê wan radibe û dibêje: "Çima hûn xwe bi karê zarokan ve mijûl dikin, werin em biçin."

Her dû xwarzî jî dibêjin: "Heya tû vî berî ranekî em naçin."

Li ser daxwaza wan diçe, wî berî radike û hefsarê dibin ber de derdixin. Piştî vî hefsarî sê carî li ser behrê re dihejînin, kurîbehrek ji behrê derdikeve, her sê lê siwar dibin û derbazî heftbehranê dibin. Piştî derbazî heftbehranê dibin, dîsa hefsar dixin bin berekê weke yê destpêkê ji bin de derxistin. Derbazî nava heftbehranê dibin û dibînin ku gelek lawirên cûr be cûr, keriyê dewaran li wê derêne Eşqelê belek jî di nava wan de ye.

Bewzî ji xwarziyên xwe re dibeje: "Herin Eşqelê belek bînin."

Lê newêrin. Ji ber ku Eşqelê belek kesê nêzikî wî dibe, dikuje. Bewzî neçar dibe bixwe diçe û dibîne ku hê kum û kumzirxê bavê wî li ser pişta hespê wî girêdayî ye. Dema Eşqelê belek wî dibîne, yekser êriş dike û dixwaze wî bikuje. Ew jî navê xwidê tîne û kulmekê datîne bêbla Eşqelê belek. Dema Eşqelê belek bêhna mala Zal dike, dengê xwe nake û

xweşdest dibe. Dema Eşqela belek girt û dît, kum û kumzirx û gurzê giran jê vekirin, laşê wî zeyt da carek din zînê wê lêkir û gurzê giran yê 366 batiman (xunkarî) li ser girêda.

Banî gavanî kir û gotê: "Here bêje Mercana Reş, eve ez hestpê bavê xwe dibim, ger bê şerê min bila bê, ger neyê vaye ez çûm.

Gavan çû û kir hewar. Mercana Reş bang kir; "Gavan, çiye?"

Gavan: "Kurê Rostem hatiye hespê bavê xwe girtiye, dibêje ez bêbextiyê nakim, ger bê şerê min, bila bê; ger neyê ezê bibim û herim."

Dema wisa got, Mercana Reş gelek dêwên balefir rakirin ezmanan û gelek leşker bi erdê re rakir û çûn şerê Bewzî.

Bewzî li hespê bavê xwe siwar bû. Xwarzayek yên xwe li pêşiya xwe yê din jî li pişt xwe siwar kir û got: " Yên li erdê xema we, yên li ezmanan xema min."

Şer destpêkir. Leşkerên Mercana Reş ji bilî yên ji mala xwe nehatîn, kes neman.

Bewzî çû gel Mercana Reş û serê wê jêkir, kevilkir, iyarê wê tejî kakir, bi serdera qesrê ve kir û got: "Bila her kes bizanibe hespê Rostem ne bêxwediye."

Piştî şer xilasbû, terş û talanên wan rakir û derbazî behrê bûn. Bû şev û çûn şkeftê. Hindî xalê wan bû nivist, hindî her du xwarzîbûn nobet girtin. Ji serava şkeftê du xuşkan gazî hevdû kirin û got: "Xwişkê eve Bewzî û herdû xwarziyên xwe hatine, sibe dema rabin bila serava şkeftê bikolin, dema kolan xalê wan wê ji xew rabe û bêje ev çi karê zarokaye hûn dikin. Wê berek mezin di kolanê de derbikeve, her dû nikarin rakin, xalê wan wê were vî berî rake. Dema vî berî rakin wê sihr betal bibe û emê jî azad bibin."

Dema sibehê radibin, dest bi kolana serava şkeftê dikin, pişt re berek mezin derdikeve, nikarin rakin, dema xalê wan ji xewê radibe, dibêje: "Ew çi karê zarokane hûn dikin?" Ew dibêjin: "Xalo were vî berî rake."

Dema Bewzî tê û ber radike, sihr betal dibe, her dû xwişkên hev azad dibin û tên gel wan. Her dû xwişkan li gel xwe dibin û qesta welatê xwe diki. Her wiha di riya xwe de ji bo Bewzî Gulbiharê jî radikin û bi xwe re dibin. Têne rexa gundekê, dibînin ku mirov, teba û her tiştê di vî gundî de hatine şinkirin.

Bewzî dibêje xwarzayê xwe: "Here gel mezinê gund û bipirse, çima her tiştên xwe şinkirine?"

Xwarza diçe û dibêje mezinê gund: "Çima we her tiştên xwe şîn kirine?"

Mezinê gund hêrs dibe û dibêje: "Ev ne karê te ye." Ji maliyan re dibêje: "Hinek nan û dew bidinê bila bixwin û biçin."

Ew dibêje: "Ezê bêjim xalê xwe."

Mezinê gund dibêje: "Xalê te kiye?"

Dibêje: "Xalê min Bewziyê kurê Rosteme."

Dema wê gotinê dibihîze, mezinê gund xwe tavêje lingê wî û dibêje; "Min bibexşînin."

Dibêje: "Min di xewnê de dîtiye mirada me wê bi destê mala zalê hasil bibe."

Bi hevdû re diçin gel Bewzî. Mezinê gund ji Bewzî re dibêje: "Darek li ser vê mila heye, çi mirovê me yê herê wê derê winda dibe."

Bewzî jî dibêje xwarzayê xwe Gurgîn: "Here wê derê da ez bi hêrs bibim."

Gurgîn diçe wê derê û winda dibe.

Dibêje xwarzayê xwe Bêje: "Here."

Bêje dibêje: “Xalo ew ne karê me ye. Ji xwe birayên min çû. Em hatine çi, tû me bi çi ve rêdikî.”

Bewzî dibêje: “Biçe.”

Dema diçe, ew jî winda dibe. Vê carê Bewzî bi xwe diçe. Gurzê xwe radike û li binê darê dide. Berê xwe dide wê li serê darekê, li beriyekê bêxwedî û di şevek tarî de. Li her çar aliyên wê stêrk tên xwar. Ji xwe re dibêje; xwarzayên min got ev ne karê me ye, min guhê xwe nedayê. Berê xwe dide li binê darê pîremêrek heye, banî wî dike û dibêje: “Were gel min da sebra min bê.”

Pîremêr dibêje: “Ez ne ji bo sebra te bînim hatime, hatime rê nîşa te bikim. Tû wê werî berê xwe bidî deştê û herî, di deştê de tûwê qesterekê bibînî, li ber deriyê qesrê tû wê dû şêran bibînî. Yek têhn yê din jî birçiye. Yê birçî tû wê xwarinê yê têhn jî avê bidiyê û tû wê deriyê qesrê vekî. Tû berê xwe bidiyê pîrejinek li ser textî razaye, her milek yê wê şemalek (find) li bere, li ber her piyek yê wê jî şemalek li bere. Tû wê biçî çûkê xwe danî li ser rayê qolincên wê û dê milê wê bigrî û hindî hêza te heye tû wê bi guvêşî û wê bêje te rabe, ezê te li behrekê bidim. Tû ranabî. Wê bêje; ezê te li berekê bidim. Tû ranabî. Pişt re wê bêje rabe, çi merezê te heye ezê pêkbînim. Wê demê tû wê rabî.”

Heman wisa dike. Piştî pîrê berdide, pîrê jêre dibêjê: “Tû wî dergehî dibînî, kafirekê kor li pişta dergehiye. Tîr kiriye nava kevanê, dema tû biçî ewê wî tîrî berde te. Dema te derî vekir, tîr li te nekeve tû wê vî kafirî bikujî. Dema te we kuşt, tû wê singa wî biqelêşî, dema te qelaşt, rê li ser singa wî nivîsandiye, ewê rê nîşa te bide. Ji wê û pê de ez nizanim.”

Bewzî heman wisa dike. Li ser singa wî nivîsiye û dibêje: “Bewzî, tû hatî tû wê biçî, ji vir û pê de ew qas germe mejiyê mirov dikele. Zivirîna te nîne, tû biziviri tû wê tune bibî. Dema tû çuyî, tû wê dolabekê bibînî, ev dolap wîsa dizivire çirîskên agir jê diçin. Eger te ew dolab girt û nehişt bizivire, wê mirazên te hasil bibin, eger te zeft nekir wê parçên te weke guhê te lê werin.”

Dema Bewzî diçe, heman wisan dibîne û heman tîşt dike û xwe li dolabê dide. Digre û nahêle biqeliqe. Dema wisa dike, sihr betal dibe. Her dû xwarza û hemû gundiyên windabuyî derdikevin û gencîneya zêran derdikeve holê.

Mezinê gund dibêje: “Îşev hûn mêvanên minin.”

Ew dibêjin: “Emê biçin lê hûnê heft têran bidin me.”

Heft têran didin wan. Têran tejî zêr dikin, bar dikin û diçin rexa bajarê xwe. Bewzî li wê derê dikeve çilxanê. Hespê bavê wî diçe nava bajêr. Bavê wî jî gurzê giran ji hest vedike, laşê hesp zeyt dide. Paşê Rostem li hespê xwe siwar dibe, gurzê giran radike, bi destekê hiltavê je bi destê din digre heta çirûsk jê diçin. Firişte lingê xwe ji ezmanan hildikşînin, hirçên pişt heftbehranê ji tirsan di fetisin, jinên dû canî berê xwe tavêjin.

Firşte dibêjin: “Ya Rebî tû destê Rostem bigrî, wê biçe xezwê (şer).”

Rostem xwe berdide meydanê. Di nava meydanê de diçe û tê. Banî Serhingê kafir dike. Serhing berê xwe dide Rostem li meydanê jê re qebû dexwaze. Ew jî li hespê xwe siwar dibe û tê. Dema tê meydanê piştî şerekê dijwar yê çend rojan, Serhing Rostem dîl digre û dibe bin kon. Sêla sor dike, li binê lingê wî ve datîne, dohn jê digre û dike sabûn. Tirsek mezin dikeve nava Aryan û Tûranan.

Zal dibêje neviyê xwe Gurgîn: “Here pey xalê xwe Soravê sor pişt çiyayê Qaf. Ew ji bavê xwe sil buye. Ji wî re bêje, kafiran bavê te dîl girtine, sêla sor dikin bi binê piyê wî ve datînin, dohn jê digrin û dikin sabûn. Bila bê hewara bavê xwe.”

Dema diçe û jê re dibejê, ew tê diçe meydanê û ji Serhing re dibêje: “Kafir, Rostem pîremêre, te xwe aniye wê rewşê ku te pîremêrek dîl girtiye, were şerê min.”

Serhing berê xwe dide wî û dibêje: “Ev jî fêrisek zexme, ezê biçim şerê wî.” Diçe şerê wî. Her dû hevdû li meydanê digrin, hevdû dibin û tîni. Piştî şerekê giran Soravê sor rimekê li Serhing dide, ji hesp tavêje, diçe rasta serê wî da şûrekê li serê wî bide û bikuje. Ji nişka ve dayîka Serhing ji binê kon lê dike qêr û dibêje: “Çavê xwe tarî neke, ew jî birayê te ye.”

Her dû radibin ser xwe û dibêjin: “Çawa em dibin birayên hev?”

Dayîka Serhing dibêje: “Rojekê Rostem hatibû şer, bi min re mabû û Serhing hingê çêbuye.”

Dema Rostem dengê wê dibihîze, bihêrs dibe, zincîrên destên xwe û qeydên lingên xwe diqetîne û dibêje: “Eger zerbê min ji zerbê mala min be, ez na êşim.”

Êdî nû Rostem û kurên xwe êrişî kafiran dikin û wan tarûmar dikin. Piştî wê vedigerin dîwanxana mala Zal.




**1- Ji cûrenivîsîna wêjeya hûnandî ya bi awayê dariştinî hatî sazûmankirine re çi tê gotin?**
a- Efsane
b- Çêrok
c- Destan
d- Roman
e- Stiran
**2- Destana "Derwêşê Evdî" berhemê kîjan nivîskariye?**
a- Firdews
b- Tentawî
c- Xelîfe Yusif
d- Fatima Loriya Goranî
e- Her çar jî şaşin.
**3- Ji xalên li jêr kîjan ne taybetmendiyek ya ciyewaziya di navbera Stiran û Helbestan de ye?**
a- Di helbestê de hûnandin ne li ser buyerekê tê çêkirin, di stiranê de hûnandin li ser buyerekê tê nivîsîn.
b- Di helbestê de em nikarin hestên xwe bi awayê pexşan binivîsin, lê di stranê de em dikarin hestên xwe bi awayê pexşan binivîsin.
c- Di helbestê de giranidayîna pir watebûn û xiyalê heye, lê di stiranê de peyv weke wateya xwe ya ferhengî tê bikaranîn.
d- Di helbestan de hest û xiyal tên ravekirin, lê di stiranan de hest û xiyal nayên ravekirin.
e- Di helbestê de hestên û bangên kesî di plana pêş de ne, di stiranê de buyerên civakî yên jiyan buyî yan dibe jiyan bibe tên bikaranîn.
**4- Ji yên jêrî kîjan ne taybetmendiyek ya Stirana ye?**
a- Nabe ku dirêjiya rêzikan newekehev bin.
b- Wate, di rêzikên jêrî de berdewan dike.
c- Buyerên civakê têkildar dikin bikar tîne.
d- Bêhtir mijarên bibandor, hînker û fêrker yên ku waneyan didin, hildibijêre.
e- Balê dikişîne li ser pîvan û kafiyê.

**5- Stirana “Mala Eliyê Yunis” çi cûrê stiranê ye?**
a- Stirana Evîndarî
b- Stirana Xembarî
c- Stirana Segvanî
d- Stirana Qehramanî
e- Stirana Buyerên Civakî

**6- Ji yên jêrî kîjan ne taybetmendiyek ya stiranê ye?**
a- Buyerên civakê têkildar dikin bikar tîne.
b- Wate, di rêzikên jêrî de berdewan dike.
c- Dibe ku dirêjiya rêzikan ne wekehev bin.
d- Cih nade axaftinên beramber.
e- Bêhtir mijarên bibandor, hînker û fêrker yên ku waneyan didin, hildibijêre.



Deryaya Reş
Gurcistan
Rusya
Ermenîstan
Azerbeycan
Turkiye
Caspian Sea
Gola Hezar
Deryaya Sipî
Surye
Iraq
Iran
Erdexan
Qers
Sewas
Erzingan
Erzorom
Agirî
Bayazid
Dersîm
Çewlîk
Mûş
Maku
Meletî
Xarput
Bidlîs
Wan
Mereş
Semsûr
Amed
Êlih
Sêrt
Riha
Mêrdîn
Şirnax
Çolemerg
Urmiyê
Dilok
Efrîn
Qamişlo
Hesekê
Duhok
Mûsil
Mehabad
Hewlêr
Seqiz
Kerkûk
Silêmanî
Sine
Qesrî Şirîn
Mendelî
Îlam
KURDISTAN
Km. 0 100 150
Miles 0 50 100